welat

Sal:3 Hejmar:114 24–30 Avrêl 1994 10.000TL (KDVD) **Rojnameya Hefteyî**

Sîdo Reşo:

'Tişt tev li cem min bi can û hest in'



Rûpel 16

Serokê Konseya Leşkerî yê ARGK'ê Cemil Bayık operasyona KT'ê ya li Başûr nirxand:

'Haziriyên me jî hene'

Operasyonên ku dewleta Tirk li başûrê Kurdistanê li hemberî gerîlayên PKK'ê pêk tîne, didomin. Di operasyonên li Botanê û Behdînanê de nêzikî 250 hezar hêzên dewletê cih digirin. Li Botanê bêhtir li derdorên Çiyayê Gebarê, li Behdînanê jî operasyon li Heftanînê gur dibin. Gerîla jî bi hêzên xwe yên livdar bi taktîkên partîzanî li leşker didin, keminan li pêşiya wan datînin.

Cemil Bayık, li ser operasyonên ku li dorhêla Çiyayê Gebarê û li Başûr ji aliyê hêzên dewleta Tirk ve tên kirin bi nûçevanê KURD–A'yê re peyivî. Bayık dadixuyîne ku zaiyatên leşkeran pir in û mebesta Komara Tirk ew e ku herêmeke tampon di navbera Botan û Behdînanê de çêbike.

Rûpel 8





Meydana Taksîmê dilê Stenbolê

Rûpel 6



Almanya û demokrasiya sexte

Rûpel 12

Hûn mazlum in

Ey birayên ezîz û dilovan
Ji bo we daîm em heyran
Hûn azadîxwaz in ji bo mirovan
Em we zanin bi dil û can

Hûn mazlum in mîna Yusuf
Heq dizanin mîna sî û tav
Heft sal di zîndanê de xwar nan û av
Paşê di Misirê de bû dest tewaf

Em digirîn û dikalin ji bo we
Her kes dizane berxwedana we
Gel ji bîr nake îşkenceya we
Hûnê bibin dîrok ji bo gelê xwe

Zilm zehf dîtine gelek pêxember
Ji bo me ne, daîm ew rêber
Piştê hingê bûne duakar
Qebûl kir duayan Xwedayê ekber

Hûn can feda ne ji bo gelê xwe
We terk kir mal û zicê xwe
We feda kir ruh û canê xwe
We hesin kir kesk û sora xwe

Em dizanin qedexe ye zimanê me
Nasname lazim e ji bo gelê me
Azadbûna we ye daxwaziya me

Di televizyon û radyoyê de bibêjin derdê me
Da hûn qîr kin bi zimanê dê û bavê me

Emê hingê bibin serfiraz
Aştî û azadî dikin daxwaz
Hûnê bibêjin; bijî azadîxwaz
Gerdûn wê bide we gelek spas

Însanê xayin em kirin bindest
Iraq û Îran em avêtin ji welat
Tirk û Ereb nedan me nan û qet
Ji me re zehf dîtin cot û xet

"Em bira ne" dibêjin
Heq û edaletê nabêjin
Ziman û çanda me radihêjin
Sûc û zilma xwe qet nabêjin

Misilmantî kirin maşe
Da ku bibin axa û paşe
Xwarin ser xulam gelek meaşe
Qet dilovan hê ne kêfxweş e

Mele DILBIXWÎN

Mele Dilbixwîn ev helbest ji bo mebûsên DEP'ê yê di zîndanê de nivîsand. Mele Dilbixwîn, hê jî li gundekî Kurdistanê meletiyê dike.

Ondêre koyê Surî

Ondêre koye Surî vera
Torga giran e vorana
Torge niya daye daye
Axir makîna wa gurîna

Zalim û dorme ma guret
Mezal nêda pero dîme
Bombey lav vanay mare
Ginayme tever te dime

Koye Munzurê miz û dûman o
Ponci havalî vore vera
Dersîm masero naleno
Dismê bi ters o nikara

Ne virena ne pêena
Naye xo vîra mekere
Xevere bi di havalî
Gona ma re gonî bijere

Şilan BERÇEM



Kovara

Stêrka

Rizgarî

DERKET

Nivîsara Welat

96 saliya rojnamegeriya Kurdî

Hin roj hene ku di dîrokê de xwedî cihên xuyayî û girîng in. Ew, di jiyana gelan de pêvajoya sed-salan mîna rojên neteweyî an jî taybetî tên nirxandin. Di her şert û hoyan de ew roj nayên jibîrkirin û bi awayekî tên pîrozkirin. Di dîroka gelê Kurd de 22'yê Avrêlê yek ji wan rojan e. Di wê rojê de berî 94 salan rojnameya Kurdan ya yekemîn Kurdistan hate weşandin. Divê bi girîngî li ser vê rojê bê rawestîn. Ji bo pêşveçûna têkoşîna gelê Kurd ev yek pêwist e.

Gelek tişt hene ku dikarin wek pîvanên hemdemî û pêşveçûyinê bên nîşandan. Yek ji wan pîvanan bêguman rojnamegerî ye. Dema mirov li rewşa çapemeniya civakekê binêre, dikare li ser demokrasî, pêşveçûn, zanebûn û gelek taybetiyên wê civakê bibe xwedî agahî.

Çapemenî ragihandin e, serbestî ye, kontrol e, nivîskarî ye, zanîn e, bi dengekî bilind fikirîn e.

Demokrasî, serbestî û pêşveçûneke bêyî çapemenî ne mimkûn e. Ev giş taybetiyên rojnamegeriyê ne, bes

Pêşvebirina rojnamegeriya neteweyî karekî ne hêsan e. Ji bo wê, pêdivê bi hin hoy û şertan heye. Ger em bînin bîra xwe ku hê zehfê Kurdên bakur –rewşenbîr jî tê de– nizanin bi Kurdî bixwînin û binivîsînin hingê pêwist nake em behsa kêmasî û tengasiyên din bikin û bi hêsanî dikarin fêm bikin ka çima ev war bi pêş neketiye.

taybetiya wê ya herî girîng û hemdem hêzbûna wê ye. Îro êdî çapemenî wek hêza çaremîn tê pejirandin. Li welatên herî demokratîk jî ger kontrola çapemeniyê tune be, demokrasî tê tahrîfkirin. Bi giştî ev wisa ye, lê dîsa jî divê neyê jibîrkirin ku li welatên wek Tirkiyeyê çapemenî ji rola xwe pir dûr ketiye û ew êdî mîna hêza çaremîn a artêşa dewletê ye.

Em werin ser rojnamegeriya Kurdî. Rojnamegeriya Kurdî mixabin dema bi ya dinê re tê muqeyesekirin, pir li paş e. Her çendî berî 96 salan rojnameya Kurdistanê dest bi jiyana xwe kiriye jî, îro hê jî em nikarin behsa rojnamegeriyeke Kurdî ya birêkûpêk bikin. Bi taybetî jî li bakurê Kurdistanê rewşa çapemeniya Kurd gelek xerab e.

Pêşvebirina rojnamegeriya neteweyî ne karekî hêsan e. Ji bo wê, pêdivê bi hin hoy û şertan heye. Ger em bînin bîra xwe ku hê zehfê Kurdên bakur –rewşenbîr jî tê de– nizanin bi Kurdî bixwînin û binivîsînin hingê pêwist nake em behsa kêmasî û tengasiyên din bikin û bi hêsanî dikarin fêm bikin ka çima ev war bi pêş neketiye.

Rewşa Rojhilat jî, ji ya Bakur ne çêtir e. Li Başûrê Biçûk Kurd di vî warî de xwedî hin ceribandinan in, lê hê jî bi serbestî nikarin vî karî pêk bînin û bi pêş ve bibin. Ew bi derxistina çend kovaran li gor îmkanên xwe karê rojnamegeriyê didomînin.

Di warê çapemeniya Kurdî de, parçeyê herî pêşketî bêguman Başûrê mezin e. Hem ji aliyê xwendin û nivîsandinê, hem ji aliyê zanîna vî warî, hem jî, ji aliyê serbestiyê ve ji hemû parçeyên din çêtir e. Lê mixabin li Başûr jî, ji ber kêmasiya derfetên teknîk û aborî em nikarin behsa çapemeniyeke qewîn û hemdem bikin.

Rojnamegeriya Kurdî ya ku berî 96 salan hîmê wê hate danîn, çima hê jî welê li paş e û nagihîje pîvanên hemdem?

Erê em dizanin dema gelek ne azad be, welatê wî parçekirî be û di nav şertên xopan de bijî, di her warî de tengasiyên wî çêdibin. Lê dîsa jî bi têkoşînê mirov dikare bingehên ku hatine danîn qewîntir bike û rê ji pêşveçûnan re veke. Rojnamegeriya Kurdî ji bo gelê Kurd dikare bibe dengekî bilind. Lê ji bo vê, xebat û hewldan lazim e.

Îro bi rojnameya Welat em dixwazin binyata ku di vî warî de hatiye danîn, xurt bikin û rê ji rojnameyên Kurdî yên rojane re vebikin.

Mazhar Günbat

Di civîna çapemeniyê ya Özgür Gündemê de encama ku derkete rastê:

Rastî wê di tariyê de veşarî nemînin

Di roja 20'ê Avrêlê de, li President Otelê ya li Stenbolê, bi civîneke ji bo çapemeniyê dadana Özgür Gündemê hate protestokirin, kirin û tehdeyên dewletê yek bi yek yên li ser wê hatin diyarkirin. Civîna ku bi axaftina xwediyê rojnameyê Zübeyir Aydar vebû, gelek kes jî sazî û rêxistinên karker, karmend, pîşe (meslek) rewşenbîr, hunermend, çapemeniya cigehî û biyanî, TV beşdar bûn û daxuyaniyên ku bi Tirkî hatin kirin di eynî gavê de li zimanê Îngilîzî jî hatin zivartin.



Ferda Çetin, Zübeyir Aydar û Ertuğrul Kürkçü di civîna çapemeniyê ya Özgür Gündemê de tên dîtin.

Zübeyir Aydar ku pê re mebûsên DEP'ê yê Amedê Sedat Yurtdaş û yê Şirnexê Selim Sadak jî beşdarî civînê bûn di axaftina xwe de derbir ku, ji roja derketina rojnameyê ta niha wek cerd, pêkutî, berhevkirina rojnameyê bi awayekî kêfî, kuştina nivîskar, rojnamevan, belavkar û xebatkaran, girtin û revandina wan kêm nebûne û gote ku di gel her tiştî ji bo azadiya kes û çapemeniyê wê têbikoşin. Parlementer û xwediyê rojnameyê yê bi îmtiyaz, sebebên kirinên dewletê jî bi şerê li Kurdistanê ve girê da û daxuyand ku naxwaze kes li dijî wê birame, weşanê bike, kes û çapemeniya ku li derveyî wê bilive bi kirinên hovane re rû bi rû dimîne.

Piştî daxuyaniyên Zübeyir Aydar Cîgirê Berpirsiyariya Giştî Fahri Ferda Çetin peyivî. Çetin serî pêşîn nameya Berpirsiyara Giştî ya Weşanê Gurbetelli Ersöz (ku niha li Girtîgeha Sağmalcilarê ya li Stenbolê girtiye) xwend. F.Ferda Çetin jî li ser rengê rojnameyê rawestiya û gote ku rojname bûye dengê hemû qat û çînên civakê û bedelê vê yekê jî daye. Li ser helwesta dewletê jî, daxuyand ku wek "rojnameyeke dijmin" hatin ragihandin û hemû kirinên hovane li ser wan hatine pê. Çetin ev nirxandin kir ku ta niha tu kiryarek nehatiye dîtin û girtin ku ev jî nasnameya wan dide.

Li ser navên sazî û rêxistinên demokratîk, wek sendîkayên karker û karmendan, odeyên meslekan, Komeleya Mafên Mirovan, Komeleya Hiqûqzanên Hemdem, TAYAD, Enstîtuya Kurdî, Navenda Çanda Mezopotamyayê, Komeleya Hemberên Cengê, Yekîtiya Rojnamevanên Swîsreyê (SJU), çapemeniya sosyalîst kes peyivîn, kirin û tehdeyên li ser rojnameyê, dadana wê protesto kirin û daxwaziya xwe ya piştgiriyê derbirîn.

Zana FARQÎNÎ

7 hezar gundiyî koçî Başûr kir

Navenda Nûçeyan– Gundiyên Kurd ji ber pêkutî û tehdeya leşkerên dewleta Tirk derbasî başûrê Kurdistanê dibin. Ji 17 gundên Qilabana Culemêrgê nêzîkî 7 hezar kes, ji ber ku hêzên leşkerî li wan kotekiyê dikir da ku cerdevaniyê bipejirînin, xwe li deverên bajarên Zaxo, Dihok û yên din girtin. Rayedarên PDK'ê ji bo ku "penaberan" di kampan de bi cih bikin, li ser wan pêstûriyê dikin.

Hêzên şerî yên dewleta Tirk beriya Cejna Newrozê li ser gundên Qilabanê cerd pêk anîn û ji bo ku gundî cerdevaniyê bipejirînin li wan tehde kirin û gotin wan an cerdevanî an jî koçkirin ji xwe re biniqînin. Li gorî nûçeya Kurd–A'yê ku ji pênûsa nûçevanê xwe Serhat Yusuf di 14.4.1994'an de ragihand, sêniyên 17 gundan ku tevî hev hejmara wan digihîje 11.665 nêzîkî 7 hezarî xwe li Zaxo, Dihok, Tilkeber, Hîzawa, Derkar, Birêh, Qesrok, Cimeh û Darozanê girtine. Tê daxuyandin ku kesê xwe li Hîzawa û Birehê girtine rewşa wan ne baş e û pêdiviyên wan bi kon û derman hene.

Nûçevanê Kurd–A'yê yê Zaxoyê Serhat Yusuf agahî dide ku li Delahê, ji 50 malî 50, li Bilehê ji 77 malî 37, li Repînê ji 70 malî 40, ji navendê 120 malî 41, li Hîlalê ji 150 malî 67, li Kolikê ji 180 malî 93, li Zirvekê ji 88 malî 48, li Roboskî ji 60 malî 33, li Nerwehê ji 250 malî 140, li Mêjinê ji 150 malî 61, li Şawetê ji 120 malî 54, li Kolgê ji 80 malî 50, li Şiriçê ji 70 malî 30, li Rewangayê ji 78 malî 55, li Ewelû ji 65 malî 30 mal, li Alagoştanê ji 72 malî 42 mal koçî başûrê Kurdistanê bûne. Gelek gundên herêmê jî nîve nîv vala bûne, li gorî nûçeyên ku gihane destê me.

Salih Benek û Derviş Kara ku li Zaxoyê li Taxa Abasiyê bi cih bûne ji Serhat Yusuf re wiha gotin: "Wan em bi zorê ji welatên me derxistin. Ev der jî welatê me ye. Lê me hûrmûrên xwe û pezên xwe bi piranî bi xwe re neanî, çi tiştê ku li ser pişta hesp dikaribû bihata me ew anîn. Li vê devera ku em lê ne PDK li me tehdeyê dike. PKK alîkariya me dike, bi me re eleqedar dibe, 23 zarokên me herduyan hene, heke ne ji zarokan bûna emê derketina çiyê. Komara Tirk bi înkarkirina meseleya Kurdî nikare bigihe cihekê, derketiye rastê ku mesele bi kotekiyê hel nabe."

Tê daxuyandin ku jî 7 hezar kesên koçbûyî li Zaxoyê, li taxên Abasiyê û Huseynyê 204, li zozanên Tilkeber û Qesrokê 228, li Dihokê 40, li Hîzawayê û li gundên wê 295, li Derkarê 91, li Bireh û nehiya Derkanê 420, li derdorên gundên Zozanê Qesrokê 155, li Cimehtê 56, li Darozanê 23 û li zozan û şikeftên nêzî gundan dijîn.

Ji Delekayê ku 50 mal jê koçber bûye Abdullah Enver, Salih Enver û Sadik Kaçan jî rewşa xwe bi van gotinan tînin zimên: "Ji ber ku wan em bi darê zorê koç kirin em li vir bi cih bûn, hin kes ji me hîn bi cih nebûne, PDK dixwaze ku me di kampan de bi cih bike, em naxwazin. Komara Tirk hesabê zilma ku bi me re kiriye wê bide."

HAWAR

Dilbixwîn

Selîm Berekat

Kurdan, hîna zanyar, nivîskar û rewşenbîrên xwe baş nas nekirine. Rewşenbîran bi xwe jî xwe nas nekirine. Her demê berhemên nivîskarên biyanî xwendine û lêkolîn û lêgerîn li ser wan çêkirine.

Rewşenbîrekî Kurd dikare bi hêsanî helbestên Nazim Hikmet, Nîzar Qabanî... û yên din ezber bike, dikare bi dorfirehî li ser Fîrdewsî, Mamûd Derwîş, Semîh Alqasim... biaxife. Jiyana wan, helbest û nivîsarên wan, mêjû û cihê jidayîkbûna wan... dikare baş ezber bike. Baş e, mirov çiqas kesan nas bike, ewqas jî zanebûna wî fireh dibe. Lê hema!

Cihê dax û mixabinê ye ku, rewşenbîrên me nikarin çend malikan ji Mem û Zîna Ehmedê Xanî ezber bikin, bixwînin û bidin xwendin. Belkî rewşenbîrên me nizanibin jî ku, mîrê helbestvanên Ereban Ahmad Alşawqî Kurd e. Piranî ji me Hacî Qadirê Koyî, Erebê Şemo... û hozanê bilbil, şalûl û çem û cobaran Feqiyê Teyran nas nakin.

Em di nava kêmasiyekê de ne. Hem di navbera biyaniyan de winda dibin, hem jî li xwe nagerin. Li aliyekî ziman û nivîsên Erebî, li aliyê din şovenîzm û Tirkkirina hebûna me û li aliyê din jî ahenga xelkên din li guhên me xweş tê. Em amade ne bi dilekî geş berhemên biyaniyan bixwînin, pirtûkên wan arşîv bikin û wêneyên hunermendên weke Pîkaso bi dîwarê odeya xwe de daleqînin, lê hema di mala me de Ehmedê Xanî, N. Dêrsimî, Osman Sebrî, Mazlum û mezinên weke Egîd nayên dîtin. Gelo, ev kêmasî ji ku derê tên? Ji zanebûna pir an jî, ji nezaniya pir!

Cihê dax û mixabinê ye ku, rewşenbîrên me nikarin çend malikan ji Mem û Zîna Ehmedê Xanî ezber bikin, bixwînin û bidin xwendin. Belkî rewşenbîrên me nizanibin jî ku, mîrê helbestvanên Ereban Ahmad Alşawqî Kurd e. Piranî ji me Hacî Qadirê Koyî, Erebê Şemo... û hozanê bilbil, şalûl û çem û cobaran Feqiyê Teyran nas nakin.

Bi rastî neteweya Kurd, gelek rewşenbîrên hêja û şareza di nava Ereb, Tirk û Farisan de winda kirin.

Yek ji nivîskarên Kurd ên mezin, ku ji hêla Kurdan ve nayên naskirin, Selîm Berekat e. Romannivîs, rojnamevan û helbestvanê navdar, ku ji mezintirîn nivîskarên hemdem e, yên bi Erebî dinivîsînin, Selîm Berekat, ji başûrê rojavayê Kurdistanê ye. Ji Kurdan bêhtir Ereb wî nas dikin, lewma jî bi qasî ku Ereb rêza wî digirin, Kurd ewqasî paya wî bilind nabînin. Lewre bi zimanê diya xwe nenivîsandiye.

Selîm Berekat, ev demeke dirêj e, ji gelê xwe dûr, li biyaniyê, bi keser, kul û axînan re jiyan dibe. Di nava nivîskar û rewşenbîrên Filîstînî de ye. Ew rewşenbîrên ku tu caran, ne di nivîs û ne jî di axaftinên xwe de em neanîne ziman, ji bilî M. Derwîş, ku rojekê ez nizanim em çawa hatine bîra wî, helbestek li ser "neviyên Selaheddîn" nivîsand.

Selîm Berekat, dema ku bi Kurdekî re diaxife, weke ku biçe li ser axa Kurdistanê bigere. Welat, gel, gundî, zarok û ciwanên Kurd bi hemû ciwanî, egîdî û çalakiya xwe ve tênebîra wî. Lewma dema ku ez ji bo vekirina Enstîtuya Kurdî bi wî re axifîm, yek ser di telefona mala xwe de got: "Her demê, hûn çi ji min bixwazin, ez bi dil û can hazir im. Ez pir xemgîn im, ku ne di nava we de me. Çiqas dilê min dixwest ez bi keda we ya buha re enstîtuya xwe ava bikim... Dîsa jî ez bi we re me, daxwazên xwe ji min re bibêjin, ezê bi hemû awahî pêk bînim..." Bawer bikin di nava axaftinên wî de min romana jiyana wî ya bêgane dixwend.

Dîsa jî divê em ji bîr ve nekin ku romanên Berekat, ji jiyana gelê Kurd parçeyek in. Cih: Kurdistan, kes: Kurd, Nav: Kurdî... Dema ku mirov Alrîşa wî dixwîne, têra dilê xwe li çiya, zozanên Kurdistanê digere, Kurdan baş nas dike. Ji ber vê yekê hinek rewşenbîrên Ereb, wî weke nîjadperestekî tînin ziman. Ew bersiva vê yekê wiha şîrove dike: "Ez Kurd im, dema ku bixwazim jî nikarim înkar bikim. Ez bi Kurd bûme însan, bawer bikin bi vê Kurdbûna xwe ve ez pir serbilind im..."

Niha ew li Qibrisê ye. Ji gel û ji welatê xwe dûr e, bi hebûna gelê xwe jiyan dibe.



Xwendekaran William Perry protesto kir

Nûçeyên Derve– Li Koreya Başûr, 200 Xwendekarî Sekreterê Parêzkariyê yê DYA'yê William Perry û helwesta DYA'yê ya li hemberî Koreya Bakur protesto kirin.

Li bajarê Kwangju (256 km ji Seoul dûr e) roja 19'ê Avrêlê 200 xwendekar û hinek nîştecihên wî bajarî li dijî Perry livbaziyên protestoyê li dar xistin. Xwendekaran ber bi Navenda Çanda DYA'yê meşek li darxistin, polîsan ji bo ku wan belav bikin, bombeyên gazê bi kar anîn, xwendekaran jî kevir avêtin polîsan. Protestoyê seatekê domand û polîsan 7 xwendekar girtin.

Li Seoul'ê jî hinek xwendekar û nîştecihan ber bi Balyozxaneya DYA'ê meşek li dar xistin. Di destê wan de pankartên wek, "Em ji te nefretê dikin Mr. Perry, em ji Patriot nefretê dikin" hebûn.

Li nêzî balyozxaneyê polîsan ew dan sekinandin û piştre 20 nîştecihan nameyek bir, da balyozxanê ku tê de Perry û DYA dihate protesto kirin. Rayedarên Koreya Bakur jî helwesta DYA û Koreya Başûr bi tundî protesto kir, anîna mişaka Patriotê wek provakasyonekê nirxandin.

Rojnameya Partiya Karkerên Koreyê Rodongê ev derbirîn kir: "Tu çek bi me nikarin, bila DYA û hevkarê wê provakasyona şer bike, emê ji bo parastina sîstema xwe ya sosyalîst û serbilindiya komara xwe. bersiveke ku derbeyeke mezin li wan bixe bidin wan."

Serokê Koreya Bakur Kim–Îl Sung, di civîneke bi dîplomatan re ku dawiya hefteya çûyî çêbû de got ku, wan hewcedarî bi çekên nuklîer tune ye. Kim Îl Sung wiha Got: "Me ne hewce ne jî hêz heye ku em çekên nuklîer çê bikin, emê tu carî nebin xwediyê wan çekan, ez bi soz û peyman dibêjim. Em dikin wê çekê li dijî kê bi kar bînin?"

Wê Zulu jî beşdarî hilbijartinê bibin

Nûçeyên Derve– Li gorî nûçeya Ajansa Reuterê, lihevrûniştinên di navbera De Klerk, Mandela û Serokê Partiya Azadiya Inkatayê Mangosuthu Buthelezi de çêdibûn roja 19'ê Avrêlê gihîşte lihevkirinê.

Ev lihevkirin bi civîneke ji bo çapemeniyê hate îlankirin.

Serokê PAI (Partiya Azadiya Afrîkayê) Buthelezi ev biryar wiha daxuyand: "Ez gelekî kêfxweş im ku vê yekê bidim zanîn, wê PAI beşdarî hilbijartinê bibe, hem di pêpelûka herêmî û hem jî ya neteweyî de wê cih bigire. Serokê Kongreya Neteweyî ya Afrîkayê Nelson Mandela jî dîtinên xwe wiha anîn ziman: "Ez bi dil û can hêvî dikim ku wê bi vê lihevkirinê, emê têkevin nav aramî û ewlehiyê. Em yek gel û yek welat in; Afrîka."

Serokê PAI'yê got ku ew peyman pejirandine ji ber ku, rê li ber şerê hundirîn û xwînrijandinê bigirin.

De Klerk jî wiha got: "Ev hêviya min herî ji dil e ku ev lihevkirin wê dawiyê li êrîşbaziyê bîne li welatê me.

Li gorî vê peymanê parlemento cara dawîn wê kom bibe û rayedariyê bide ku, qanûnê bingehîn der heqê Qralê Zuluyan Goodwill Zwelithini û herêma Zuluyan Kwa Zulu de bên derxistin.

Wek tê zanîn Zuluyan Qanûna Bingehîn ya berê di Berfanbara 93'yan de li ser lihevkirin çêbûbû nedipejirand û di gel nîjadperestên çermspî serxwebûn dixwestin.

Bi vê peymanê rê li ber şerê hundirîn hate girtin û rê li ber hilbijartinê vebû. Ji destpêka reforman vir ve 15.000 kes di şerê navbera PAI û KNA'yê de hatine kuştin.

Li Rwandayê şerê hundirîn

Ji ber şerê hundirîn li Rwandayê gelek mirov hatin kuştin, gelek jî bûn penaber. Heta niha zêdetirî 400 hezar kesî derbasî Burundiyê bûne.



Li welatê Rwanda ku li ser kişwara Afrîkayê ye şerê ku bi kuştina **Serokkomar Juvenal Habyarîmana,** di navbera du qabîleyan (Hutu û Tutsî) dest pê kir bi tundî didome. Serokê Rwanda Habyarimana di gel **Serokkomarê Burundî Cyprien Ntaryamina** û 8 kesên din roja 6'ê Avrêlê dema ji Tanzanya (ku ji bo guftûgoyên aştiya herêmî çûbûn) vedigeriyan balafira wan bi roketan hate xistin û ev hatin kuştin.

Leşkerên Artêşa Rwandayê ku ji Qebîleya Hutu ne berpirsiyariya vê bûyerê da ser milê serhildêrên Tutsî, **Eniya Welatparêz ya Rwandayê** û ji bo tolhildanê leşker û hinek çeteyan berê xwe dan kesên ji vê qebîleyê. Li ser vê yekê 600 gerîlayên ku piştî peymana aştiyê li Kîgalî yê bi cih bûbûn, ketin şerê be leşkeran re. Piştre 2000 gerîla ji çiyan daketin Kîgaliyê, heta niha gelek kes hatine kuştin, zêdetirî 400.000 kesî bûne penaber û derbasî nav Burundî bûne wek penaber.

Hêzên navneteweyî ji bo rawestandina şer tiştek nakine, tenê her welat ji bo rizgarkirina hemwelatiyên xwe kar dike. NY'ê rayêdarî nedaye hêzên xwe yên li wir ku têkilî şer bibe, hêzên aştîparêz li bûyeran temaşe dikin.

Her çiqas hinek hevdîtin ji bo rawestanidina şer çêbûn jî negihiştin tu encamê. Leşker rê nadin ku alîkariya tendurîstî û qûd jî bigihije mirovên sivîl. Eniya Welatparêz ya Rwandayê ji bo şerrawestandinê hinek daxwazan (şert) pêşkêş dikin; "Divê dawî li hovîtiyên (kuştin) ku çeteyên Hutu dikin, bê. Parêzkarên Serokatiya Neteweyî ya Hutuyan bên belavkirin. Kesên ku qirkirin pêkanîne bên girtin."

Tanzanyayê pêşniyar kir ku ji gengaşiyên aştiyê re bibe mazûban, fermandarê NY'ê ev pêşniyar gihand herdu aliyan, herdu alî jî ne di rewşa bersivdayînê de ne.

Seroka Komela Azadiya Gel û Mafê Mirovan ya Rwanda Monique Mujawamariya (38) roja 18'ê Avrêlê li Monteralê xwest ku NY bargehekê li Rwanda ava bike, ji bo dawî lê anîna vî şerî.

Mujawamariyê ku piştî despêkirina şer reviyabû Montrealê wiha got: "Heke qirkirin li her derê Rwandayê bidome, êdî em tu car derfetê nabînin ku bizivirin welatê xwe." Wê piştre gotina xwe wiha domand: "Xeynî kujyaran tiştek li wir namîne." Mujawamariya bi çalakiyên xwe yên ji bo parastina mafê mirovan tê nasîn, ji ber vê yekê di 1992'an de leqayî suîkastekê hatibû.

Roja 19'ê Avrêlê leşkeran stadyomeke ku di bin garantiya leşkerên hêzên NY'ê (Neteweyên Yekbûyî) de bû û tê de 8500 mirovên ji şer reviyan hebûn, dan ber topên hawanê. Ev stadyom ji aliyê 500 leşkerên Bangladeşî yên aştîparêz ve dihat parastin. di vê bûyerê de 20 kes hatin kuştin, 50 kes jî birîndar bûn.

Samî BERBANG

NASNAMEYA RWANDAYÊ

Komara Rwanda

Gelhe (nifûs): 6.989.000 (li gorî reqemên 1989'an)
Aqar: 26.338 Km2
Paytext: Kîgalî
Qewmên ku hene: Hutu (%84), Tutsî (%14)
Zimanên fermî: Fransî, Kîryarwanda û Kişwahîlî
Ol: %65 Roman Katolîk, %25 Baweriyên Xwecihî

DÎROK

Di sedsala 16'an de Tutsiyan êrîş bir ser vî warî, desthilatdarî ji Hutuyan stand, di bin bandora Almanyayê de keyitiyek ava kir.

Di 1899'an de di gel Burundiyê ket bin hikmê Belçîkayê, 1919 bû êrdima taybetî ya NY'ê, lê karê rêveberiyê dîsa bi destê Belçîkayê hate meşandin.

Piştî şerê duyemîn (1959) Serhildana Hutuyan çêbû, dawî li desthilatdariya Tutsiyan hat û Rwanda bû welatekî serbixwe.

Di 1962'yan de derbeya leşkerî çêbû. Di 1973'yan de derbasî rêveberiya sivîl bû.

Ji 1980'yan heta çend hefteyan ku serokkomar hate kuştin û şerê hundirîn dest pê kir. Ji aliyê Konseya Neteweyî (ku ji 70 kesan pêk



tê) ve dihate meşandin. Desthilatdarî di destê serokkomar û Konseya Serokwezîran de bû.

ABORÎ

Aboriya Rwandayê bi taybetî li ser çandinê ye.
Hilberiyên çandinî: Çay, titûn, qehwe, gilgil, fasûlî.
Madenên wek; wolfrom, kolumb–tentalît, berîl, amlîgonite hene. Ev welat xwediyê rezervên gaza metanê ye.

Gerîla Şirnex xiste gemaroyê

Hêzên gerîla yên PKK'ê girtin ser Şirnexê û bi şeş milî ve êrîş birin ser hêzên Tirk ku hîn nû li herêmê bi cih bûne. Dorpêça PKK'ê di 20'ê Avrêlê de û seat di 11'an de pêk hat. Di êrîşa şervanên PKK'ê de gelek çadirên leşkerî hatin şewitandin. Der barê kuştî û birîndaran de tu saloxek nehate standin.
Ji hêla din ve dîsa gerîla ji du milî ve cerdek bire ser Tabûra Madenê û bînaya li ser riya Dihê ku ji hêla tîmên taybetî ve dihate bikaranîn. Ji vê bûyerê jî der mafê kuştî û birîndarên hêzên dewletê de agahî nehate wergirtin. Navenda Tugaya Şirnexê tevî çadirên leşkerî ku li dorê hatine vegirtin, ji hêla gerîlayan ve ji Başûr ve ji du milan û ji Bakur ve jî, ji du milan ve hatin hingavtin. Bînaya Tugayê bi topên hawanê hatin kutan û nehate zanîn ka hêzên dewletê di vê qewmînê de çiqas zaiyat dan.
Dîsa tabûra ku li Gundikê Melle ye ji aliyê gerîlayan ve nêrevanên wan hatin gulebarankirin. Tanqeke ku diçû gund li mayineke tanqşkên ertilî û tevî personelên tê de mehf bûn.

Kurdî Başûr:

Ême agaman le hêrişî Tirk niye

Dû niwênerî hukumetî herêmî Kurdistan le Anqera rayan geyand kewa hîç agadariyekî pêşwextiyan le ser hêrişî hêzekanî dewletî Turk bo ser Kurdistanî başur niye. Her weha ew dû niwênere wiyan kewa, ew hêrişe ziyanêkî zor degeyenêt be planekanî hikumetî Kurdistan bo awedan kirdinewey ew nawçane.
Şazad Sayb niwênerî YNK le Anqere le peywendiyekî telefonî da legel rojnamey Asharq Al-Awsat da witî: Hîç zaniyariyekî pêşwextî le ser ew hêrişe niye, û ewîş le dezgakanî rageyandinewe pêy zaniwe, her wiha Sefîn Dizey niwênerî KDP û hikûmetî Kurdistan le Anqere witî kewa hikûmetî Tirk layene Kurdiyekanî Başurî xeberdar nekirdûwe lemer hêrişeke bo başûr.
Eme û şayenî bese kewa çend rojêke hêzakanî Tirk le naw xakî Kurdistanî başur da hêrişiyan birdote ser baregakanî partî kargeranî Kurdistan, ke lêyewe hêriş debene ser artêş Tirk le naw xakî Kurdistanî Bakur da beniyazî damezrandinî dewletêkî Kurdî serbexo.

Le rojnamey Asharq Al-Awsat ewe



Di kongreyê de pêşî çalakiyên sala çûyî hatin nirxandin, piştre jî pêşniyarên ji bo sala bê hatin pêşkêşkirin, Kongre bi beşdariya gelek şexsiyetên Kurd çêbû.

Enstîtuyê kongreya xwe çêkir

Enstîtuya Kurdî ya Stenbolê, Kongreya xwe ya Duyemîn çêkir û Lijneyeke kargêriyê ya nû ji xwe re niqand. Ji kesên berê, Serokê Enstîtuyê Şefîk Beyaz û Endamê Lijneya Kargêriyê Felat Dilgeş cihê xwe di ya nû de jî hevişandin.

Di 17'ê Avrêlê de, li Stenbolê li "Tarik Zafer Tunaya Kültür Merkezi" Enstîtuya Kurdî ya Stenbolê bi beşdariya endam û gel ve komcivîna xwe ya duyemîn çêkir û Lijneya xwe ya Kargêriyê ji nû ve hilbijart. Di komcivînê de ku axaftin bi piranî bi Kurmancî hate kirin û li Tirkî hate wergerandin, Kaya Müştakhan, Sabah Kara û Zimanzan Torî peywira Dîwanê pêk anîn.

Serokê Enstîtuyê Şefîk Beyaz rapora çalakiyan bi xwendinê pêşkêşî gel kir, her wiha rapora dahat û lêçûnan jî, ji beşdaran re xwend. Piştî pêşkêşkirina raporan, endam û kesên beşdar rexne û pêşniyarên xwe derbirin, çalakî û kirinên Enstîtuyê hatin nirxandin.

Di pey rexne û pêşniyaran de, lîste ji bo Lijneya Kargêriyê ya Enstîtuyê hatin pêşkêşkirin. Raydan bi awayekî diyar ve hate kirin û ji bo kargêriya nû ev nav hatin pejirandin; ji bo lijneya bingehîn:

Şefik Beyaz, Cemşid Bender, Zimanzan Torî, Felat Dilgeş, Feqe Huseyn Sagniç, M. Şafi Ekinci, Raif Yaman.

Lijneya Cîgir:

Edibe Şahin, Sîrwan Reşîd, Adil Kurt, A. Riza Aslan, Nijat Yaruk.

Wek tê zanîn, Enstîtuya Kurdî di 18'ê Avrêla 1992'yan de li Stenbolê hatibû vekirin û ji bo damezirandina wê, şehîdê nemir Musa Anter, İsmail Beşikçi, Abdurrahman Durre, Feqe Huseyn Sagniç, Yaşar Kaya, Cemşîd Bender, İbrahim Gürbüz, Talat İnanç û Süleyman İmamoğlu xebitîbûn. Enstîtu li gorî rêziknameya (nîzamnameya) Navenda Çanda Mezopotamyayê hatiye avakirin û tabeleya Enstîtuyê hîn di demà vekirina Enstîtuyê de ji aliyê polîsan ve hatibû daxistin û niha jî enstîtu bêtabela ye.

Mihemed RONAK

Di navbera pêşmerge û leşkerên Tirk de şer derket

Navenda Nûçeyan– Li başûrê Kurdistanê 40 hezar leşkerên KT'ê ku roja 17'ê Avrêlê di herêma Berwarî de bi cih bûbûn xwestin ku têkevin Çiyayên Mesînan'ê ku tê de hêzên ARGK'ê yên seyar hene, lê pêşmergeyan rê nedan ku ew têkevin vê mintiqeyê. Li ser vê yekê roja 18'ê Avrêlê di navbera leşker û pêşmergeyan de şer derket. Di vî şerî de zêdetirî 20 pêşmergeyên PDK'ê hatin kuştin. Li cihê ku şer derketibû hîn ji herdu hêz li hemberî hev in.

Li gorî nûçeyan hêzên KT'ê bi 40 hezar leşkerî 20 km di nava Başûr de çûne û li herêma Zaxoyê Berwarî, li çolên gundên Kanîmasî, Silê û Zergelê bi cih bûne. Ev dever ji aliyê balafirên şer yên KT'ê ve tê bombekirin.

PDK'ê ji bo ku der heqê vî şerî de hesîsandina (teftîşkirina) bûyerê bike endamekî xwe yê navendî Neçîrvan Barzanî şand vê herêmê.

Dîsa tê gotin ku hêzên Başûrî beşdarî operasyonên KT'ê nebûne û şerê di navbera hêzên KT'ê û pêşmergeyên PDK'ê de derketî di hemû rojnameyên Başûr de cih girtiye.

Di operasyonê de heta niha 70 leşker hatine kuştin 200 jî hatine birîndar kirin. Di şer de 2 helîkopter ji aliyê hêzên ARGK'ê ve hatine xistin, 3 gerîla hatine kuştin û 18 gerîla jî winda ne.

Operasyon bi 220 hezar leşker û 20 balafirên leşkerî didome. Li herêma Berwarî gundê Kanîmasiyê roja 17'ê Avrêlê ji aliyê balafirên Tirk ve hate bombekirin. Di wan bombebaranan de du mirovên sivîl, yekî 65 salî, yek jî zarokekî 9 salî birîndar bûn.

Daxuyaniya Hevkariya Şoreşger a Demokratîk:

Hêzên Împeryalîst nikarin rê li ber têkoşîna gelê Kurd bigirin

Navenda Nûçeyan– Hevkariya Şoreşger a Demokratîk li ser helwesta Almanyayê li hemberî gelê Kurd (a di Newrozê de xwe dabû der) û hilbijartina herêmî civînek li dar xist. Li gorî daxuyaniya ku piştî civînê hate weşandin, wan di civîna xwe de biryar dan ku wê li hember helwesta Almanyayê têbikoşin. Ev hevkarî ji wan rêxistinan pêt hatiye: PKK, TKP-ML, TDP, TKP/ Kıvılcım û DHP.

Di daxuyaniya Hevkariya Şoreşger a Demokratîk de wiha tê gotin: "Gelê Kurd li Almanyayê ev Newroza ku di jiyana wî de xwediyê cihekî girîng e, pîroz kir. Hikûmeta Alman kir ku Newrozê li wan qedexe bike, lê negihîşte mebesta xwe. Ew Kurdên ku li her deverên Almanyayê dijîn gişkan li gorî giyana Newrozê, cejna xwe pîroz kir.

Almanya ji ber têkiliyên xwe yên dîrokî û aborî yên bi Tirkiyê re, di şerê navbera gelê Kurd û Tirkiyê de sûcdariyê dike. Ev sûcdarî 5-6 meh in didomin û niha jî li ser erdê Almanyayê berdewam e. Almanya alîkariya leşkerî, aborî, konevanî û hwd. dide Tirkiyeyê û bi vê jî nasekine di welatê xwe de êrîşî ser gelê Kurd dike. Dewleta Alman "di heyna" "şerê sar" de sembolên komunîzmê qedexe kiribûn, niha jî sembol û wêneyên gernasên Kurd qedexe dike, reng û alên ERNK, PKK, ARGK'ê û wêneyên Abdullah Öcalan qedexe dike. Têkoşîna gelê Kurd li Ewrûpayê û di nav Hêzên Şoreşger û raya giştî ya Ewrûpayê de gihîşte encamê û bi mafdar tê dîtin."
Di daxuyanê de ev jî tête gotin: "Em Hevkariya Şoreşger a Demokratîk qedexekirina sazî û dezgehên demokratîk yên gelê Kurd li Ewrûpayê û li Almanyayê protesto dikin."

Meydana Taksîmê dilê Stenbolê



Her çiqas bi van zilm û zordariyan, bi qedexekirina sendîka, komele û partiyan, dewleta Tirk xwest rêxistinên karkeran ji hêz bixîne û wan belav bike. Lê cardin ez pir meraq dikim ewqas ronakbîr û demokratên Tirkan pê çûbûn. Ka çi bi wanrêxistinên çep yên Tirk hat ku ev meydan îro vala ma û ev meydan ji aliyên faşîstên Tirk ve hate dagirtin. Ev pirs gerek e hemû şoreşgerên wê demê ji xwe bipirsin û bersiva wê bidin.

Meydana Taksîm wek neynika pêşketin û paşveçûna gelê Stenbolê ye. Kîjan partî an tevger xurt bibe, hêza xwe li wê derê nîşan dide. Dema min çend roj berê di televizyona Tirkan de seyir kir, ku bi dehhezaran alîgirên partiya faşîstên Tirk û fanatîkên îslamî li meydana Taksîmê civiyane, ez şaş û mat mam. Çimkî, heta niha ev meydan ji aliyê sendîkayan, hêzên çep û demokratan ve dihatin xemilandin. Niha dirûvê Afganîstanê pê dikeve.

Ez bi xwe demeke gelek dirêj li Stenbolê mam û hema hema ketim hemû xwepêşdanên ku li meydana Taksîmê çêdibûn. Ji van 1'ê Gulana 1977'an baş tê bîra min. Di navbêna 400–500 hezar karker, xwendevan, mamoste, rewşenbîr û hunermend, di destê wan de pankart, afîş û alên reng bi reng, bi rêz meşiyan ketin nava meydana Taksîmê. Çi mixabin, ev mitînga 1'ê Gulanê ji aliyê kontrgerîla ve bi qetlîamek barbarî hate belavkirin. Wek tê zanîn 37 mirovên pêşverû û demokrat li navîna meydanê, li ber çavên 500 hezar kesî hatin qetilkirin û tu kes ji van kontrgerîlayan nehate girtin û hê jî ev komplo derneket holê. Wê demê Süleyman Demirel Serokwezîr bû û muneqeşeya kontrgerîla dest pê kiribû.

Her çiqas bi van zilm û zordariyan, bi qedexekirina sendîka, komele û partiyan, dewleta Tirk xwest rêxistinên karkeran ji hêz bixîne û wan belav bike jî, lê cardin ez pir mereq dikim ewqas ronakbîr û demokratên Tirkan pê çûbûn. Ka çi bi wan rêxistinên çep yên Tirk hat ku ev meydan îro vala ma û ev meydan ji aliyên faşîstên Tirk ve hate dagirtin. Vê pirsê gerek e hemû şoreşgerên wê demê ji xwe bipirsin û bersiva wê bidin.

Min van rojan xwend ku îsal Platforma Demokrasiyê dixwaze 1'ê Gulanê li meydana Taksîmê pîroz bike. Ev biryar gelek di cih de ye. Lê bes nîn e. Gerek e pêşverû û demokratên Tirk pişta xwe bidin hêzên rizgariya gelê Kurdistan û li dijî dewleta hov û barbar siyaseteke pir vekirî û radîkal bidine pêşiya xwe. Paş ve gav avêtin xwîn dide hêzên paşverû û faşîst û her wiha dewleta Tirk jî har dike.

Îro, roj bi roj rejîma faşîst a Tirkiyê cihê lingên xwe dişidîne û sitembariya xwe li ser karker û karmendan zêde dike. Rejîma Tirkiyê bi navê demokrasiyê siyaseteke milîtarîst, qeydeyên durû û propagandaya demagojiyê bi kar tîne:

* Li dijî têkoşîna Kurdan her tewir êrîş û îftirayan teşwîk dike.

* Parastina Kurdîtî bi çi rengî dibe bila bibe, ew bi her awayî tê perçixandin.

* Xwepêşdana Kurdan bi îcaze be jî –wek nimayişa cenazeya Mehmet Sincar– bi rengekî har û neyartiyê tê belavkirin û mitîngên karker û memûran jî bi jopan.

* Lê, mitîngên hêzên faşîst û paşverû bê îcaze be jî, polîs têkilî wan nabe û jê aliyê hemû medya Tirkan ve tên reklamkirin.

Dewleta Tirk der barê tevgera îslamî de jî durûtiyê dike. Ji aliyekî ve tevgera îslamî li dijî rizgariya neteweya Kurdî wek alternatîfekê nîşan dide û dixwaze xurt bike, ji aliyê din ve diçe ji welatên rojava re dibêje: "Ger hûn alîkariya me nekin wê Tirkiye wek Îranê bibe." Wek tê zanîn di dema Şahê Îranê de SAWAK û CIA li dijî demokrat û pêşverû yên Îranê teroreke bêhempa bikaranîn, ew ji holê rakirin û bi vî awayî meydan ji tevgera îslamî re hiştin.

Lê ev alternatîfa îslamî ji bo tevgera rizgariya gelê Kurdistan derbas nabe. (Li Kurdistan a Rojhilat –perçayê di bin destê Îranê de– jî, tesîra îslamî di nav gel de kûr nebû) Li Kurdistanê şerekî çekdarî dûr û dirêj ji bo rizgarî û azadiya gelê Kurdistanê heye û dubendiyekî kûr wek neyartî di nav gel de çêbûye; ji aliyekî ve piraniya gelê Kurdistanê ji bo doza xwe serî hildaye û di vî riyê de her tiştên xwe winda kirine û ji aliyê din ve jî, kulmek cehş ji tirsa dewleta Tirk û ji bo çend quriş pereyan xwe firotine û bi xwînxwarên faşîst ên Tirk re êrîşî gelê xwe dikin. Bi vî awayî xayintî û welatparêzî diyar bûye. Di eniya xayinan de hemû hêz û partî yên Tirkan cih girtine û di wan de kîjan partî xurt dibe bila bibe, ew ji aliyê gelê Kurdan ve pir girîng nîn e. Ji bo ku hemû jî êrîşkar in û xwînxwar in.

Lê, der barê demokrasiya Tirkiyê de mirov nikare eynî tiştî bibêje. Dema gelê Kurd alîkariya çep û demokrat ên Tirk neke, hevkêşeya ku di navbera hêzên faşîst û em bibêjin bi awayekî demokratan de heye, xerab dibe. Me ev encam di hilbijartina 27'ê Adarê de gelek vekirî dît. Hemû belediyeyên bajarên mezin, metropol ji destê Sosyal Demokrat ên Tirk derketin û li wan deran Partiya Refah bi ser ket.

Ji wan encamên ku min li jor jimartin, bi hêsanî mirov ji hevdu derdixe, ku çiqas hewcedariya gelê Kurd bi piştgiriya demokratên Tirk heye, ewqas jî pêwistiya çepên Tirk bi hêzên welatparêz ên Kurdistanê heye. Di vir de siyasetek şermok, di bin tesîra propaganda kemalîzmê, şovenîzmê de mayîn, derneketina li dijî qetlîam û êrîşên milîtarîst –ku dixwazin Kurdan wek neteweyek ji binî ve ji holê rakin– ji bo mirovek demokrat û hêzên siyasî mirin e, qedîn e.

Meydana Taksîmê dilê Stenbolê ye. Stenbol cih û merkeza çîna karkeran e, navenda xwendevan, rewşenbîr û hunermendan e, nîveka çand û kulturê ye û deriyê Ewrûpayê ye. Ji ber vê yekê jî nêzîkî 3 milyon Kurd li Stenbolê dijîn. Heke li vir meydan ji faşîst û paşverûyan re maye, ev kêmaniya hêzên çep e, tunebûyîna siyaseteke vekirî ye. Gelek heyfa min pê hat, ku meydana Taksîmê, dilê Stenbolê di bin cizmeyên faşîstan de, di bin şaşikên sofiyan de diheje.

S. İzzet GÜVEN

Şeva Piştgiriya Rojnameya Welat
Solidaritets afton för tidningen Welat

PROGRAM
Axaftin
Birîndar
Koma Amedê (govend)
Helbest
Nasir Rezazî
Şiyar

Bilêt: 50 kr.
Plats/Cih: Åsö Gymnasium
Datum/Dem: În, 29.04.1994
Kl./Kat: 17.30





Hemdemî ew e ku mirov karibe bi serbestî her cure siyaseta dewletê rexne bike.

İsmail Beşikçi (Civaknas)

KÊ ÇI PEKAND?

Amerîka dixwaze Stenbolê veguherîne (bike) paytexta Bîzansê.

Bülent Ecevit
Serokê Partiya Çepa Demokratîk

Li ser Eniya neteweyî

Hûn biryarê bidin ez bi we re me



Wek tê bîra me, ji bo avakirina Eniya Neteweyî gotûbêj û xebat di navbera partiyên siyasî yên bakurê Kurdistanê de berî selekê dest pê kiribû. Ji wê rojê û heta îro li ser vê pirsê çend agahdariyên kurt jê derxe, kesî li ser xebata di vî warî de tiştek nenivîsand û pirs nenirxand. Di daxuyaniyeke ku di Avrêlê de hat belavkirin tê gotin kar ji bo avakirina Eniya Neteweyî berdewam e û wê di demeke nêzîk de bi serfirazî dawî lê bê.

Çend meh berê hevalekî ku ji gotûbêjên berê yek tişt bihîstibû, behsa civînekê dikir. Li gor vî hevalî, muneqeşe wek ku em li jêr dibînin bûbû.

Partiya A: Hevalên hêja yên "demokrat û welatparêz." Hûn xêr hatin civîna me ya çaran a li ser avakirina Eniya Neteweyî. Wek ji bo we jî diyar e, em hîn di destpêka muneqeşeyan de ne. Hîn em teorî û prensîban muneqeşe dikin. Pêşniyara min ev e ku em îro bi awayekî din ragihêjin pirsê. Em li ser program û xebatê rawestin. Kî dikare çi bike em wê muneqeşe bikin. Mimkûn e em bi vî awayî bigihîjin encamekê.

Partiya K: Na, wisa nabe. Divê em berê bikaribin di teoriyê de li hev bikin.

Partiya V: Û piştre divê em çend biryarên prensîbî bigirin.

Partiya H: Wele, ji bo min ferq nake. Hûn biryarê li ser çi bigirin ez bi we re me. Jixwe ji xeynî min endamê partiya min tune ne. Ez tenê me. Min got, divê dîsa jî ez wezîfeya xwe ya welatparêzî bînim cih. Lê bi şertekî ez bi we re me. Heger hûn gişt li ser hemû xalan li hev bikin, ezê di muneqeşeyan de nebim asteng û ezê piştgiriya we bikim. Bi hemû awayî ez amade me.

Partiya Z: Ez bawer nakim ku em bikaribin di demeke wisa kin de bigihîjin encamekê. Avakirina eniyê gelek zehmet e. Em her yek li derekî Ewrûpayê ne. Her du–sê mehan carekê em nikarin karê xwe biterkînin û bên civînê. Li aliyê din, ji bo hatina vir gelek mesref jî dibe.

Partiya Î: Eyb e lo, tu behsa mesrefê dikî. Ezê heqê riya te bidim. Ew e li Kurdistanê her roj bi dehan însan dimirin û tu behsa mesrefê dikî.

Partiya Z: Keko, çima dikahirî? Ne ez tenê belê gelek ji hevalan ku li vir in di rewşeke xerab de ne. Ma her kes wek te xwediyê milyonan e.

Partiya D: Pêşniyareke min heye. Em hîn nizanin emê bikaribin vê eniyê ava bikin an na. Bi baweriya min divê hinek heval ji bo hin çalakiyên partiya xwe li xwe rexne bigirin. Hevalên din jî hemû dizanin ku di vî şerî de gelek zarok û pîrek jî têne kuştin. Bi taybetî zarokên cerdevanan. Pêşniyara min ev e ku heval uzra xwe bixwazin û rexneyan ji bo van çalakiyên nebaş li xwe bigirin.

Partiya N: Wele, tu rast dibêjî. Du meh berê lawekî pismamê min jî hatibû kuştin.

Partiya K: Ma pismamê te cerdevan e?

Partiya N: Ne niha. Piştî mirina pismamê min û hemû mirovên me dev ji cerdevaniyê berdan. Û niha hemû perîşan bûne. Nan tune ku bixwin. Ez carina ji wan re çend kronan dişînim.

Partiya A: Bes e hevalno! Bi vî awayî em nikarin dest bi civîna xwe bikin... Baş e, Eniya Neteweyî çi ye û ji bo çi pêwist e, me dûr û dirêj di civînên xwe yên bihurî de li ser vê dîtinên xwe got. Îro em li ser beşkirina kar dîtinên xwe bibêjin. Rêxistinên ku dê di Eniya Neteweyî de cih bigirin, dikarin çi karî bikin?

Partiya Î: Wele, li welêt em nikarin zêde tiştekî bikin. Lê ji Ewrûpayê her tişt em û hevalên din tev dikarin bikin. Ez baş ziman jî nizanim.

Partiya Z: Wele, li welat kesî me jî tune ye. Em jî dikarin li Ewrûpayê alîkariya we bikin.

Partiya H: Min di destpêka axaftina xwe de got, di partiya min de ez tenê me. Ez dibînim ku tu ferq di navbera me de nemaye. Hûn jî dibêjin kesekî we tune ye ku li welêt kar bike. Ma min digot qey emê di eniyê de kar bikin û bi vî awayî yekîtiya neteweyî pêk bînin. Wisa xuya dike ku yekîtiya gel bêyî me çêbûye. Heger hûn nikarin kar bikin, rola we dê di eniyê de çi bibe?

Partiya Z: Ma heval tu dixwazî em herin şer?

Partiya H: Na, min tiştekî wisa negot.

Partiya M: Ya te çi got?

Partiya V: Heval şer nekin. Em hemû dizanin ku kes Ewrûpayê naterikîne û naçe şer.

Partiya Î: Rast e. Em naçin şer, lê divê em bi hevalan re yek tiştan bikin.

Partiya V: Divê ERNK û ARGK girêdayî Eniya Neteweyî be.

Partiya A: Ê ku hûn beşdarî şer bin?

Partiya Z: Ma çi ferq dike. Teknîk bi pêş ve çûye. Telefonên beriyan, bêtêl û faks hene.

Partiya A: Na loo.

Partiya K: Em nikarin piştgiriya şer bikin. Partiya me ji destpêkê û heta îro xwestiye bi aştiyê pirsa Kurdan çareser bike. Dewlet mezin e, ma em dikarin bi şerê çekdarî di vê pêvajoya îroyîn de vê pirsê hel bikin? Li aliyê din kesekî me yê ku em bişînin şer jî tune ye.

Partiya H: Di esasê xwe de em hemû xelet dikin. Kurdistan xeyal e. Ji bo xeyalan ne pêwist e ku em ewqas xwe aciz bikin. Divê her kes li kêfa xwe mêze bike û li dû xeyalan baz nede.

Partiya Z: Tu wek cerdevanan û wezîrên dewletê dipeyivî. Ew çi hal e ku tu tê de yî. Te xwe li Ewrûpayê winda kiriye.

Partiya H: Ê helbet Ewrûpa tesîrek baş li min kir. Li aliyê din, hemû gotinên cerdevan û dewletê jî ne derew in.

Cûmalî COTKAR

Jûjî... **Doğan Güzel**



Serokê Konseya Leşkerî-yê ARGK'ê Cemil Bayık operasyona KT'ê ya li Başûr nirxand:

'Haziriyên me jî hene'

Cemil Bayık, li ser operasyonên ku li dorhêla Çiyayê Gabarê û Başûr ji aliyê hêzên dewleta Tirk ve tên kirin bi nûçevanê KURD-A'yê re peyivî. Di hevpeyvîna ku di 18.4.1994'an de hatiye kirin de, Bayık dadixuyîne ku zaiyatên leşkeran pir in û mebesta Komara Tirk vegirtina hin deverên başûrê Kurdistanê ne, pê jî namîne derdibire ku KT'e dixwaze herêmeke tampon di navbera Botan û Behdînanê de çêbike.

– Hûn operasyonên Komara Tirk ên li başûrê Kurdistanê çawa dinirxînin?

Cemil Bayık: Derbasbûna Komara Tirk bi tenê ne bi mebesta operasyonê ye. KT, ne bi giştî be jî dixwaze li beşekê bi timî bi cih bibe. Dixwaze herêmeke tampon biafirîne. Niha ji Xabûrê (ji devera ku sînorê Tirkiye-Iraq û Sûriyê digihîje hev) heta Mîrozayê (devera ku sînorê Îranê diqede) leşkerê Tirk tê de ne. Leşker bi riyên hewayî hetanî hundirê başûrê Kurdistanê hatine danîn. Jixwe ta îro ji Zapê ketine Kanîmasiyê. Niha çênebe jî, dibe ku pey de pey bikevine Zaxo, Dihok û wekî din û wan deveran vegirin.

– Taktîkên vê herekatê çawan têne pê?

Cemil Bayık: Pêşî bi balefirên cengê bombebaran dikin. Pê re leşkerên xwe dadixin û ji aliyê Bakur ve jî, ji reşayê ve leşker tê. Dîsa deverên ku vala dimînin bi helîkopteran leşkerên xwe tê de bi cih dikin.

– Hûn niha dikarin bibêjin çiqas hêz ajotine vî warî?

Cemil Bayık: Belê niha 50 hezar hêzên leşkerî hene. Ev yekîneyên ku ji wan re dibêjin artêşa taybetî, cerdevan û her wekî din in. Dema ku dadixînin zaiyatê didine ber çavên xwe, anku dema leşkeran ji helîkopter û balefiran dadixînin dayîna zaiyatê wan zêde eleqedar nake. Heta ji ber vê yekê di nava heftiyekê de bi dehan leşker ji aliyê gerîlayên me ve hatine kuştin û hejmareke mezin jî birîndar bûne. Hem di lihevxistinan de û hem jî di axaftinên bêtêlan de ev rewş diyar dibe. Di vê operasyonê de ji dehan yekê kuştiyên xwe ji raya giştî re danaxuyînin. Em dev ji raya giştî berdin, bi pîkolî daxistinê dikin û dibînin ku çiqas leşker ji aliyê me ve bi gulebarandinê têne kuştin; ev yek jî tê wêmaneya ku yekineyên dadixin ji çav derxistine.

– Li hemberî vê operasyonê helwesta hêzên başûrê Kurdistanê çawan e?



Di nav şer de hêzên ARGK'ê wext dibînin ku hem şer bikin hem jî govendê bigirin

Cemil Bayık: Di vê rewşa heyî de, derfeta wan tune ku dengên xwe derxin, jixwe Komara Tirk gundên wan jî bombe dike û wan pê ditirsîne; her wekî bibêje heke hûn dengên xwe derxin ez dê hin bêhtir bombe bikim, deverên li hundir jî bombebaran bikim. Heta du roj berê di dema daxistinê de du pêşmerge bi çi sebebê niha em pê nizanin bi awayekî diyar dan ber guleyan. Ango herekata vegirtina Başûr ku destûr nadin kes jê re bibe asteng diqewime. Ev rewş her çiqas ji bo hêzên Başûr wiha be jî tê dîtin ku hin peyayên PDK'ê kincên leşkeran li xwe dikin û beşdarî operasyonê dibin, rêberiyê jê re dikin, leşkerên Komara Tirk li sîperên gerîlayan digerînin, ji hêzên ku ji hewayê xwe danîne re rê nîşan didin, heta li nêzikî qereqolên xwe hêzên ku wan danîne diparêzin. Belê, gava vê yekê jî dikin, bi veşarî dikin ku bertekiya hêzên Başûr, raya giştî ya Kurd nekişînin ser xwe. Kincên leşkerên Tirk li xwe dikin û dikin. Ev yek jî, ji hêla gerîlayên me ve hatiye dîtin.

– Behs ji operasyoneke mezin ku li deverînê Gabarê tê kirin. Bi ya we têkiliyek di nav herdu operasyonan de heye?

Cemil Bayık: Operasyona li Gebarê jî di vê çarçoveyê de ye. Nêzîkî 45 hezar hêzên leşkerî xistine wê derê jî. Bi şêweyekî diyar ve, bi hêzên hewayî leşker reşandin, taktîkan bi dest xistin û di dest de hiştina araziyê, bombekirina deverê, bombekirina gundan, bi top, hewan, tanq û balefiran ve, koçberkirina gundiyan, heke nebin cerdevan, girtin, îşkencekirin, kuştin hwd. têne kirin. Operasyona li wê jî wek a li Başûr bi sê qonaxan ve tê pêk anîn. Ev, bi mebesta di arazî de bi cih bûn, dorgirtina li gerîla û ku karibe pelaxtina gerîla ye. Yanî pêşî, bi cihbûna di araziyê de, bi taybetî jî li niqteyên stratejîk, zaiyatê jî didine ber çavên xwe û bi helîkopteran ve leşkeran dadixînin jêr, wan bi hêzên ku ji reşayiyê ve dikevine araziyê teqwiye dikin. Bi vî awayî di araziyê de bi cih dibin, lê serwer dibin, piştre jî lê dixebitin ku cihên yekîneyên me tespît bikin û dor li wan bigirin. Belê ku vê yekê karibin bikin, armanca wan jî pelaxtina gerîla ye. Yanî li pey herekata ku sê armancê wê hene ne.

– Ta niha ev hersê armancên xwe pêk anîne? Zaiyatên we û Komara Tirk çi ne?

Cemil Bayık: Di vê navê de hîna negihîştine hedefên xwe. Jixwe beriya herekatê gelek amadehiyên xwe kirin û bi hinceta Newrozê, dîsa bi hinceta ewletiya hilbijartinê leşker û navgînên teknîkî kişandin herêmê, hêzên me jî di gel vê yekê gelek amadehiyên xwe kirin. Yanê em jî li hember operasyonê amadekar in.

Ji ber ku haya me hebû, em bi tevdîr bûn, zaiyata komara Tirk zêde çêbû. Mînak, me gelek ziyan gihande yekîneyên wan ên ku xwe li Avaşînê danîn û niha jî dikêfire ku hêzên xwe bide hev. Ev rewş ji bo deverînê din jî wiha ye. Zaiyatên me pir kêm in. Ji ber ku komara Tirk di gel dayîna zaiyatan, leşker dadixist zehf ji wan hatin kuştin ku hejmara wan bi sedan tê îfadekirin. Heta ji ber vê yekê, kumandarên xwe kişandin Şirnexê û li hev civiyan û ez guman dikim li ser kifşkirina taktîkên nû, pîvana bertekiyên li ser zaiyatan rawestiyan.

Ji ber ku haya me hebû, em bi tevdîr bûn, zaiyata komara Tirk zêde çêbû. Mînak, me gelek ziyan gihande yekîneyên wan ên ku xwe li Avaşînê danîn û niha jî dikêfire ku hêzên xwe bide hev. Ev rewş ji bo deverînê din jî wiha ye. Zaiyatên me pir kêm in. Ji ber ku komara Tirk di gel dayîna zaiyatan, leşker dadixist zehf ji wan hatin kuştin ku hejmara wan bi sedan tê îfadekirin. Heta ji ber vê yekê, kumandarên xwe kişandin Şirnexê û li hev civiyan û ez guman dikim li ser kifşkirina taktîkên nû, pîvana bertekiyên li ser zaiyatan rawestiyan. Belê em navaroka civînê nizanin, lê ji qewmînan ev dertê. Ji hêla din ve, herekat niha di qonaxa bi destxistina arazî de ye. Li hin deveran hêzên KT' xwestin bi pêş ve bikişin û nêzikahiyê li yekîneyên me bikin, lê bi taktîkên kemînan ên gur ve, bi cerdên li ser deverên wan ên ku lê bêhna xwe vedidin, ziyaneke mezin me da wan. Kete rewşa xwe-parêziyê û milên xwe yên ku li pêşiyê dikişiyan vekişandin. Niha bi xurtkirina parêziya hêzên xwe ve eleqedar in. Bi awayê ku min got, hazirîyên me jî hene. Çalakiyên me yên li dijî taktîk û hedefên wan wekî her gavê zindî ne. Û her-roj têne pê û derbe li wan têne xistin.

Mirov dikare vê operasyonê bi şerê 92'yan yê Başûr re qiyas bike. Ev ji şerê 92'yan mezintir e û bi armanca mayînê ye. Wek ku min da xuyakirin, bi mebesta vegirtina Başûr, afirandina herêmeke tampon tê kirin. Jixwe hêzên ku di Botan û Behdînanê de bi cih kirine li derdorê 200 hezarî ne, bi dehan balefir, helîkopter û bi hezaran wesiteyên bi zirx jî beşdarî vê hêzê ne. Di rastiyê de taktîka ku di serhildanên Kurd yê berê de bi kar anîne, niha bi parastineke teknîkî û hêzeke pir ve dixwaze li vir biceribîne ku tê wateya pirpitîna dawî, ya KT'ê bi eşkere xwe datîne rastê. An wê ji binî ve têk here, an jî wê hin qezencan bi dest bixîne.

Ji bo me jî, ji binî ve qezenckirin, dîsa qezenckirin û ji wê pê ve jî ne mebestek û ne jî riyek heye. Gelê me di ve merhaleyê de hewceyî vê yekê ye. Êdî hewceya gelê me jî bi parçeyeke axa welêt a azad heye ku jê re karibe bibêje welatê min û bi serbestî bêhn bide bistinê, lê îşkence nebe û di nav gelê dinyayê de cihê xwe yê bi rûmet bistîne. Ev jî hedefa artêşa me, partiya me û hemû gelê me ye. Em dixwazin ku ev bibe hedefa mirovahiyê û hovitiya KT'ê di vê çarçoveyê de protesto bike, xwe biavêjê pişta me. Bi kurtî, çi herekata Başûr a vegirtinê, çi hewlên wê yên ku careke din Botana ku ji destê wê çûyî dixwaze vegire, emê bikin ku hew karibe jê derê û bibe goristana komara Tirk. Em xwedî biryar in jî. Hemû hêzên me yên gerîla ji dayîna şerê vê yekê, hemû gelê me ji bo berxwedana bi vê armanca partiya me jî, ji bo meşandina xebatên bi vê mebestê biryardar in.

Wek ku serokê me yê mezin jî gotiye wê sala 1994 bibe sala mirad pêkirina parçeyên welêt û tê de serdestkirina îqtîdara gel.

NÊRÎNEK

Milîtarîzm ne çare ye

Komara Tirkiyeyê, partî, siyasetvan û hemû dezgeh û saziyên dewletê yên berpirsiyar divê êdî bizanibin ku pirsa gelê Kurd bi darê zorê û milîtarîzmê ne dawî lê tê û ne jî çareser dibe. Û divê êdî bê fêmkirin ku dewlet vê pirsê bi serê xwe metodên nerm bi kar bîne jî nikare çareser bike. Ev pirs bi alîkariya dewletên emperyalîst û bi hevxebatkaran jî hal nabe.

Divê dewlet û yên ku karê dewletê dikin û dimeşînin li formulekî din bigerin. Her çiqas ji bo gelek pirsên civakî formulên hazir tunebin jî ji bo çareserkirina vê pirsê zehmetiya dîtina çaran tune ye. Berî her tiştî divê dewlet nasname û realîiteya gelê Kurd qebûl bike. Divê hebûna gelê Kurd di siyaset û zagona bingehîn de bê qebûl û fermîkirin. Divê hemû mafên nevteweyî ku gelê Tirk azad a jê xwedî derkeve ji bo gelê Kurd jî derbas bibe. Divê demokrasiya ku dewletê di devê xwe de kiriye beniştê ji beniştbûneke pûç derkeve û di realîtê de bête dîtin û jiyandin.

Ji bo ku dewlet van bikare bi cih bîne divê bi Kurdan re rûne. Helkirina pirsê ji îro û pêyî ve bêyî Kurdan, bêrêxistinên wan ne mumkun e. Gelê Kurd ji bo jiyaneke azad têrî xwe xwîn rijandiye û eziyet dîtiye. Di cîhanê de tu gelî ewqas sal ji bo ku bikarebe xwe û nasnama xwe bide qebûlkirin ewqas berxwe nedaye, ewqas zilm, tade û zordarî nedîtiye, ewqas dengê barûtê û kuştin nedîtiye. Gelê Kurd jî divê wek hemû gelên cîhanê bibe xwediyê mafên xwe yên neteweyî. Gelê Kurd jî hewcedariya mafên demokratîk û rojên ronî ye.

Ji bo ku gelê Tirk bikaribe azad bijî û dewlemendiya jiyanê û axê baş binirxîne pêwist e gelê Kurd azad bibe. Ji bo vê jî divê hemû astengiyên siyasî û zagonî ji holê rabin. Bi biryarnameyan, bi hovîtî û zordestiyê, bi lêdan û êşandinê, bi girtin û kuştinê, qelskirin û qedandina gelê Kurd û tevger û têkoşîna wî ji îro pê ve çareserî ne mimkûn e.

Ji dîroka neteweyên din û yê xwe, divê dewlet û gelê Tirk dersan bistîne. Diyar e ku hemû neteweyên ku xwediyê çend milyon nifûs in xwediyê dewletek serbixwe ne. Bi kîjan metodên xerab û hov dibe bila bibe dewletek qet nikare demekî dûr û dirêj pêşiya gelekî ku biryara azadiyê daye bigire. Gelê Kurd jî zûde ye ev biryar daye. Dewlet û neteweya Tirk divê êdî vê rastiyê bibîne û ji bo çareserkirina pirsê gav biavêje. Ev zêdeyî heftê salan e ku her babet metod hatiye ceribandin. Lê dîsa jî gelê Kurd li ser piyan e û di daxwaza xwe de ji demên bihurî pir îsrartir e. Tevgera siyasî îro ji duh pir xurtir e. Têkoşîna azadîxwaz îro bersiva daxwazên gel ji duh pirtir dide. Ji bo vê ye ku ev gel ewqas damîşa azînên hov dibe. Dagirker êdî wisa bi hêsanî nikare xulamtiyê bi Kurdan bide qebûlkirin. Gelê Kurd êdî dizane hêbûn û tunebûna wî bi vê tevger û têkoşînê ve girêdayî ye. Ji bo vê ye ku şoreş li her deverê, di her warî de fireh, kûr û bilind dibe.

Têkoşîna gelê Kurd li hember siyaseta dewletê ya nîjadpersetî, înkar û asimilasyona reaksiyoneke gelêrî ye. Ew reaksiyon û bi vê ve girêdayiye, reaksiyon wê heta ku qedexe ji holê rabin bidome. Lê dê pir xwîn biherike. Sekinandina xwînê bi meşandina siyaseteke pakij, bi qebûl û naskirina gelê Kurd û mafên wî ve mumkun e. Divê dewlet û cîhan vê bibîne û bizanibe.

M. Ali TÜYSÜZ

.....NÛÇEYÊN CENGÊ.....

Çiyayê Gabarê rû nade artêşa Tirk

● *Dewleta Tirk, li Kurdistaê ji bo pêvajoyek nû, dest bi operasyonan kir. Karbidestên birêvebiriya Komara Tirk, di axaftinên xwe de her diyar dikin ku ewê vê havînê li Kurdistanê rê li ber şer û gerîla bigirin.*

● *Pêvajoya ku ew dil dikin jî, Kurdistanek vala û bêdeng e. Ji bo vê yekê jî Artêşa Tirk kete nav axa Kurdistana Başûr û ji bo herêmek tampon, li wir bi cih bûn. Lê li gorî agahiyan daxwaza wan nîvco maye û di van operasyonan de ew bi ser neketine.*

Navenda Nûçeyan- 13 Avrêl 1994- Li gundê Derşevê ku di qantara Çiyayê Gabarê de ye, gerîlayên ARGK'ê mayîn raxistin û bi pêpeskirina leşkerên Tirk ve teqiya, leşkerek mir û serbazek jî birîndar bû.

Cerdevanên gundê Babekê avêtin ser gundê Kovexê ku ev gund li ser Hezexê ne, 4 cerdevan mirin û yek jî jê birîndar bû. Di 12'ê Avrêlê de li nêzî gundê Hûyikê ku li ser Pasûrê ye, di navbera hêzên leşkerî û gerîlayên ARGK'ê de şer derket, 4 leşker mirin, piştî vî şerî hêzên dewletê li hemberî gerîlayan dest bi operasyonan kirin û di van operasyonan de (ku di navbera gundê Risê û Pinansê de qewimî ye) gerîlayek (Samet) mir û qumandarê hêzên leşkerî jî birîndar bû.

Li gundê Rîsê ku li ser Licê ye, konvoyeke leşkerî kete kemîna gerîlayan. Di şer de 3 leşker mirin û 9 leşker jî birîndar bûn. Ji hêla din ve li devera Yenîsuyê jî ku di nav hidûdê Erzîncanê de ye, konvoyeke leşkerî kete kemîna gerîlayan, 5 leşker mirin û gelek leşker jî birîndar bûn. Di 12'ê Avrêlê de li devera Geliyê Kêsan ku li ser Hîzanê ye, di navbera gerîlayan û hêzên dewletê de şer derket, 7 leşker û 4 gerîla mirin.

Di 13'ê Avrêlê de li gundê Aqresê (Akbağ) ku li ser Mêrdînê ye, di navbera gerîlayan û hêzên leşkerî de şer derket, 2 gerîla mirin. Piştî şer, hêzên leşkerî ji gund mirovek bi navê Kemal Ay, dane ber guleyan û ew kuştin.

Hêzên Tirk yên leşkerî, di 13'ê Avrêlê de derbasî nav axa Kurdisatana Başûr bûn. Hêzên leşkerî di devera Dersaw de derbasî Heftanîn, Kanîmasê û Kampa Şehîd Bêrîvan bûn. Di vê derbasbûnê de helîkopterek leşkerî xesar dîtiye û li gorî agahiyên herêmî, zêdeyî 200 leşkerî yan mirine û yan jî birîndar bûne.

14 Avrêl 1994- Di navbera Şirnexê û Qilabanê de gerîlayên ARGK'ê konvoyeke leşkerî xistin kemînê. Di şer de gerîlayek mir, lê li mirî û birîndarên hêzên leşkerî tu agahî bi dest neket.

Gerîlayên ARGK'ê hêzên leşkerî li devera Bircellayê xistin kemînê, 10 leşker di vê kemînê de mirin û serbazek jî bi mayinê ve birîndar bû. Li devera Garisanê hêzên leşkerî ketin kemîna gerîlayan, 5 leşker di vê kemînê de mirin. Berî niha bi demekê jî gerîlayên ARGK'ê cerdevanên gundê Xerbekê ku li ser Hezoyê ye, xistin kemînekê. Di vî şerî de 6 cerdevan mirin.

Di operasyonên leşkerî yên di navbera navçeyên Licê, Pasûrê û Darahênê de ku didomiyan de, di navbera gerîlayan û hêzên leşkerî de şer derket. Di vî şerî de 5 leşker mirin û 3 leşker ji birîndar bûn. Di operasyonên hêzên leşkerî yên Çiyayê Gabarê de, di navbera hêzên leşkerî û gerîlayan de şer derket. Di vî şerê de gelek leşker mirin û 3 gerîla jî birîndar bûn. Hêzên leşkerî, li gundên Garisan û Ersê gelek mal şewitandin. Di vê şewitandinê de gerîlayên ARGK'ê girtin ser leşkaran, 4 leşker mirin.

15 Avrêl 1994- Li devera Avaşînê ku di nav hidûdê Kurdistana Başûr de ye, şerê di navbera gerîlayan û hêzên dewletê de heye, didome. Li vê deverê hêzên leşkerî li hemberî gerîlayan tu serkeftin pêk neanîne. Li gorî agahiyan li vê deverê hêzên leşkerî yên Tirk, 2 pêşmergeyên Partiya Demokrat a Kurdistanê dane ber guleyan û kuştine.

Di 14'ê Avrêlê de gerîlayên ARGK'ê avêtin ser gundê Kutê, ku li ser Berwarî ye, di êrîşa gerîlayan de gelek cerdevan mirin. Dîsa, di 14'ê Avrêlê de li devera Mutkê, di navbera gerîlayan û hêzên leşkerî de şer derket. Di vî şerî de tu agahî der heqê mirî an birîndarên leşkerî de bi dest neket. Konvoyek hêzên leşkerî li Mazgîrtê kete kemîna gerîlayan. Di vî şerî de gelek leşker mirine.

Li Qagîzmanê, di hundirê panzereke leşkerî de bombeyek teqiya, 5 leşker mirin. Ji hêla din ve li gundê Söğütlüyê ku li ser Dîgorê ye, bombeyek teqiya, 3 leşker mirin. Di 15'ê Avrêlê de li gundê Bilvanisê ku li ser Baykanê ye, gerîlayên ARGK'ê bi îxbarê ketin kemîna leşkerî, 4 gerîla mirin.

Di 16'ê Avrêlê de li nêzî gundê Sêbanê ku li ser Sasonê ye, gerîlayên ARGK'ê li ser rê di kontrolan de 4 cerdevan kuştin.

16 Avrêl 1994- Hêzên artêşa Tirk, bi 200 hezar leşkerî li herêma Botanê û Behdînanê operasyonên xwe didomînin. Di van operasyonan de heta vê gavê gerîlayek miriye û 2 leşker jî birîndar bûne. Di van operasyonan de gelek leşker mirine û birîndar bûne. Hêzên Tirk, gundên Mavreş û Şîvî bi balefiran bombebaran kirin. Di bombebarandinê de gelek gundî mirin.

Gerîlayên ARGK'ê, bi hawanan tabûra Alaç ku li gundê Kaşûranê ye bombe kirin. Gelek bombe li tabûrê ketin, lê der heqê mirî û birîndaran de tu agahî bi dest neket.

Di 15'ê Avrêlê de hêzên leşkerî li ser riya Elemût û Xabûrê ketin kemîna gerîlayan. Li ser vê bûyerê jî tu agahî bidest neket.

Ji hêla din ve tabûra Şîvêk ku li ser Qilabanê ye, di 15'ê Avrêlê de ji aliyê gerhilayan ve bi hawanan hate bombekirin. Di bombebarandinê de 7 leşker mirin.

Gerîlayên ARGK'ê hêzên leşkerî li ser riya Bespîn û Silopiyê xistin kemînê. Di vê kemînê de tanqek li mayinê qelibî û tevî leşkerê hundirê wê bi hewa ket.

Gerîlayên ARGK'ê li çiyayê Bizina ku bi Çiyayê Gabarê ve ye, girtin ser hêzên leşkerî yên Tirk. Di vî şerî gelek leşker mirine.

Li deverên Seyyare, Derye û Gabarê jî gerîlayên ARGK'ê girtin ser hêzên Tirk, 5 leşker mirin û gelek leşker jî birîndar bûn. Hêzên leşkerî li vê deverê bi 40 wasiteyên leşkerî ve, ji bo alîkariya hêzên xwe, bi cih dibin.

17 Avrêl 1994- Li devera Satoçê ku di nav hidûdê navçeya Darahênê de ye, hêzên leşkerî ketin kemîneke gerîlayên ARGK'ê. Leşkerek mir û 2 leşker jî birîndar bûn.

Cendekê muxtarê gundê Sûsikê ku li ser Dêrikê ye, li ser riya Serêkaniyê (Ceylanpinarê) hate dîtin. Muxtar, heft roj berê ji aliyê hin kesên nenas ve hatibû revandin.

Li Dêrikê ku li ser Mêrdînê ye, mirovek bi navê Aliye Bekçî wek hevalbendê dewletê dihat naskirin ji aliyê gerîlayan ve hate kuştin. Piştî vê bûyerê di navbera gerîlayan û hêzên leşkerî de şer derket, gerîlayek mir. Gerîlayên ARGK'ê, xetên telefonê yên ku di navbera Elîhê û Hezo de bûn rûxandin.

18 Avrêl 1994- Gerîlayan, girtin ser gundê Sînê ku li ser Licê ye. Di sergirtina gerîlayan de gelek cerdevan mirin. Li devera Girêsor ku di nav hidûdê navçeya Farqînê de dimîne, gerîlayan mewziyek bi tevahî hate rûxandin. Der heqê miriyên hêzên leşkerî de tu agahî bidest neketin.

Li ser riya Berwarî ku li ser Sêrtê ye, qemyonek cerdevanan li mayina gerîlayan qelibî, 2 cerdevan mirin û yek jî birîndar bû. Hêzên leşkerî, li devera Derşîne ku li ser Pasûrê ye, ketine kemîna gerîlayan. Di kemînê de 4 leşker mirin û hêzên leşkerî yên ku ji bo operasyonan derketibûn vê deverê, ji ber vê êrîşa gerîlayan bi şûn ve vegeriyan.

19 Avrêl 1994- Gundên Artekê û Weşînê ku li ser Darahênê ne, ji aliyê hêzên dewletê ve hatin şewitandin. Ji hêla din ve hêzên dewletê li gundê Hore ku li ser Hanê ye, 6 mal (xanî) şewitandin. Gerîlayên ARGK'ê girtin ser hêzên leşkerî yên li gundê Şipeynik ku li ser Licê ye, bi cih bûbûn. Di sergirtinê de gerîlayan roketavêj jî bikarnîn û gelek leşker, bi vê êrîşê mirin.

Gerîlayan girtin ser hêzên leşkerî yên ku li ser Çiyayê Gabarê bi cih bûbûn. Di êrîşa gerîlayan de gelek leşker mirin. Hêzên leşkerî yên ku di navbera Yedîsû û Pilemoriyê de (li ser Dêrsimê ne), derketibûn operasyonan, ketin kemîna gerîlayan. Di vê bûyerê de 3 leşker mirin û gelek leşker jî birîndar bûn.

20 Avrêl 1994- Di navbera hêzên KT'ê yên leşkerî ku ji bo ketina başûrê Kurdistanê derketibûn operasyonan û gerîlayên ARGK'ê de li her cepheyî şer didome. Yek ji van jî li girê Tiryanê pêk hat. Gerîlayan girtin ser mewziyên leşkerî yên ku li girê Tiryanê bi cih bûbûn, 2 leşker mirin û gelek leşker jî birîndar bûn.

Li devera Şêxan ku di nav sînorê navçeya Şemtaxê (Mazidağı) de ye, cemseyek leşkerî li mayîna gerîlayan qelibî, serbazek (üsteğmenek) û 3 leşker mirin. Hêzên leşkerî yên ku li devera navçeya Kîxiyê ku li ser Çepekçûrê ye, derketine operasyonan, ketin kemîna gerîlayan. Di vê kemînê de ji konvoya leşkerî 3 cemse xesar dîtin. Lê der heqê mirî û birîndaran de tu agahî bi dest neket.

Ruh û vînayişê di newe biyayeni

Senîn merdim ruh keno kean, newe û înara zî hîsê hînsanan virazeno. Tabî no viraştiş hîsê bêvengey nê, hîsê îsyan.û serverzayenê yo. No serverzayen, no îsyani zî kuli, dirbetê mîletê no. Ki no mîletî bi çear (4), bi panç (5) zaravay di û heyjdêş (18) lehçey di xu rê formilêno newe geyreno û wazeno ziwanê xu bikero, ziwanêno serbest, zi ziwananê mîletê ay bînî. Heta nika zarawayê soranî zaf çî ameyo nûşnayeni. Birayanê ma yê werdî "soranî" aliyê zaravayê xu, xu resnayê û zaravayê xu kerdê zaravayê nûşî. Ney di zî zaf çî zî, bi no zaravaya ameyo nûşnayeni (Kitabê, mektebî, tarîx, hondorawa, istanikî, romani û çihê ay bînî (û.ç.a). Qandê ma, o ki zaravayê xu di herfê latînî anê kar nêşenê na derya ra aw bişmê û têyşanêya xu bi nêya bişiknê. Helbet çiyêno herî muhîm o yo ki; ma zarawayanê Kurdî biyarê pêhet û nêyra ziwanêno dewlement virazê. Çi wext, ma no zarawayan ra ziwanêno newe virazeyenê gerek ma rewşê dinya, ziwananê dinyay zî bifikrê û kamcîn alfabe qandê ma rind û qiymet o ma yê êy biyarê kar.

Weşanxane yê "Sara" nêy çiyê ki mi fikiryayê, înarê çare vîna û kitabê hondirawayê (şiîrê) Pêşew Merîwanî "Razî Dil" transkrîbe kerdo (yanî hem tîpê erebî, hem zî tîpê latînî pêheti kar ardo). Bi no karê xu ya "Sara" çiyêno zaf rûmet, weş viraşt, kerd. Nika ma şenê hondirawa yê Pêşew Merîwanî bi zarawayê înaya biwanê û bi no şekla ma şenê hondirawa, destan, roman û heme nûş û çiyê îna bi zarawayê îna bi tîpê latînî biwanê. No zî ma rê îmkanêno newe peyda keno ki, ma yê nûş û çiyê îna fam bikerê, biwanê. No wendiş zî bi zarawayê înaya yeno wendeni. Bi nêya, ma zî nermtir nermtir çiyê ki bi zarawayê soranî ameyo nûşnayani şenê biwanê. Yanî weşanxaneyê Sara çiyêno zaf rûmet kerd.

Kitabê Pêşew Merîwanî, hondirawa yên Pêşew Merîwanî xu parêzêno. Vatenê girani zî xu ser di qebûl nêkeno. Vano ez tiyadira, vano ez dijî dijmina, vano ez serwerzayeni hîsanê bê sinora û vano ez bi şimaya evîndar biyayeni êlimyaya. Verê na kitabê nûşkari, şeş (6) kitabê ci ameyê çap kerdeni. Nîna ra hîrê qandê qeçekan, hîrê zî hondirawa yê (şiîrî yê) nûşkariyê.

Kitabê nûşkari ki qandê qeçekan ameyê çap kerdeni nêyê;

1. Mam Rêwî–1 (Mam rovî–1) "Istanikî" 1989
2. Mam Rêwî–2 (Mam rovî–2) "Istanikî" 1991
3. Meteley niwê bo mindalan û lawan

Kitabê hondirawa yê nûşkari ki ameyê çap kerdeni nêyê;

1. Kilpey Şoriş (Alawî Şoriş) 1989
2. Razî Dil (Nepeniya dil) 1986
3. Destim Bigre (Destê min bigire)

Mi bi xu heta nika kitab û nûşê no nûşkari nêwend bî. Co ki mi bi xu tîpê erebî nêşayê biyara kar û biwana. Labirê no kitabi nûşkari "Razî Dil" ki bi Bavê Barzan transkrîbe kerdo, biyo mi rê îmkanêno gird û newe da destê mi ki ez no kitabê nûşkari biwana. Bi nêya mi hondirawayê nûşkari, hostatêya êy û mi dest bi îmkanêno gird da ki, ez hostetêya zarawayê soranî zî, zengînêya êy zî vînaya. Gerek heme kitab û çiyê nûşî ma wûnî bikerê ki, pê fam bikerê. Kitabê "Razî Dil" tenya transkrîbe niyo. Miyanê "Razî Dil" di, didi zarawa ameyo karkerdeni. Nînara jew (1); soranî. A didi (2) zî; hewramî yo. Yanî Pêşew Merîwanî, bi no karê xu ya, qandê ma îmkanê wendeni didi zaraway da vernî yê ma. Mi bi xu zî kitabê xu yê "Rondikên çavên tî" wûnî virast biya. Çiyê wûnî elbet neweyo. Gerek ma na ray dê dom kerê û berhemê/ eserê wûnî zaf kerê.

Pare
Tif le pare... tif le pare
Ke nasaz e le gel bê des
Hemîse hawel zordar e
Qet nebû pare yekcar
Be nîwaniyîs...
Rûkat e malî hejar
Belam le mal dewlemendan
Ewêt be mal û xêzan
Tif le pare... tif le pare...
Hemîsê hawel zordar e.

Perey
Tifî parey rê... tifî perey rê
Nêbeno enbaz bi merdima ra
Her wext zext o serê merdim di
Pere qe nêbiyo
mêyman zî
û nêameyê kêye yê feqîri
Labirê kêye yê dewlemend di
beno enbaz û merdim
Tifî perey rê... tifî perey rê...
Her wext zext o serê merdim di...

Pere
Tifû li pere... tifû li pere
Bi mirov re nabe heval
Her dem zextkar e li ser mirov
Pere qet nebûye
Mêvan jî
Û nayê mala feqîran
Lê li mala dewlemendan
Dibe heval û hogir
Tifû li pere... tifû li pere
Bi mirov re nabe heval

Mazinderan Şahî 1978

Kitabê Kurdê rojhîlatî (Kurdê Îran) Pêşew Merîwanî şêhrê Merîwan di maya xu ra biyo. Nika Swêdi şêhrê Göteborg di roşeno. O zî Kurdê ma yê bînî surgûn di ro. Û surgûn qandê êy zî biyo îlham. Derdê xu, kulê xu, hesretê xu ano ziwan û motîfê newe dano hondirawa yên xu. Pêşew Merîwanî nûşkari surgûn nê, nûskarê kean û verê zî çiyê xu welati çap kerdo. Labirê berhem, eserê ci surgûn di qalîteyê newe giroto. Pêşew Merîwanî nûşkari nûjeno, newe yo. Ziwanê ci zey êy a şoreşger, ziwanê ci tûj û ziwanê ci ziwanê sitrano. Pewîsto ki no kitab bîro wendeni.

Faruk YAKUP

Kovara Enstîtuya Kurdî ya Stenbolê: ZEND


Enstîtuya Kurdî ya Stenbolê bi navê "Zend" kovareke sê mehane derxist. Organa Enstîtuyê Zend, di vê hejmara xwe ya pêşîn de cih daye gotarên li ser gelşa alfabeya Kurdî ya Latînî.

Di sergotara Zendê de li ser sebebê navlêkirina wê tê rawestin û wiha tê gotin: **"Çima me ev nav hilbijart? Ji bo ku em navekî ji vê kovarê re bibînin, em gelekî hizirîn, pir nav hatin ber me. Lê di dawiyê de bi piranî ev nav hate ecibandin. Belê çima Zend? Zend peyveke xurt û pir bi wate ye û navekî ji navê pirtûka pîroz Zerdeşt Pêxember e. Me ev peyv li vir, di wateya hêza zanînê de bi kar anî."**

Nivîsên ku di vê hejmara pêşîn de cih ji wan re hatiye veqetandin hema bi giştî li ser gengeşiyên alfabeyê ne. Ji aliyê din ve nivîseke dirêj li ser salvegera sedemîn a **Celadet Bedirxan** tê de heye û ji hêla **Felat Dilgeş** ve hatiye nivîsîn. Dîsa nivîsa ku **Yaşar Kemal** li ser şehidê nemir, nivîskarê Welat, Rewşen, Yeni Ülke, Özgür Gündemê û Serokê Enstîtuya Kurdî ya Stenbolê **Musa Anter** ku di 20'ê Rezbera 1992'an de li Amedê hate kuştin nivîsiye. Ji aliyê F. Dilgeş ve bi navê **"Em bi van destên bi xwîn nekevin sedsala bîst û yekemîn"** hatiye wergerandin.

Nivîsên din hin jê ev in: **"Alfabeya Kurdî"** Jemal Nebez, **"Di alfabeya Kurdî de babeta muneqeşeyên kronîk"** Baran Rizgar, **"Ji bo reforma alfabeya Kurdî ya Latînî ramanên li ser pêşeroja zimanê me"** Îsmet Şerîf Wanlî, **"Pirsgirêkek û Pêşniyarek"** Malmisanij, **"Bûyera Dengan"** Torî, **"Çend gotin li ser zimanê Kurdî"** Firat Cewerî, **"Rastnivîs"** F. Huseyn Sagniç.

Di nasnava Zendê de ev agahî hene: Xwedî û Berpirsiyarên Nivîsaran **Sedat Tuncer**, Birêveberê Kovarê yê Giştî **Şefik Beyaz**, Redaksiyon; **Şefik Beyaz, Raif Yaman û Felat Dilgeş**



Berga pirtûka Zend, hejmar: 1

Navnîşana Kovarê: Tarlabaşı Bulvarı No:128 Beyoğlu/İstanbul
Tel: 254 76 28

8 helbestên Letîf Helmet bi Soranî û Kurmancî

Bila şahinşah guhdar bin şaîrek dixwaze bipeyive

(Soranî)

YEKEM TÊBÎNÎ
Ba şehanşakan gwê bigrin
Şaîrêk deyewê bidwê...
Ba reşbakan rawestin
Nêrgizêk deyewê birwê..
Ba tifengekan bêdeng bin
Minalêk deyewê binwê..

HEJAR Û BORJÛWA
Cantay destî borjûwakan,
Pare û gedey birsî tiyaye..
Cantay şaîr
Wişey ciwan û şîîrî agir..
Naxî dilî borjûwakan,
Kiçoley rût rût î tiyaye..
Belam dilî hejarekan,
Her nîştîman û nîştîman..

BO MARX
Ke dît xwênî çewsawekan
Dekrê be xene û be wisme
Bo simêlî,
Palewane xesawekan,
Ke dît serî hejarekan
Dekrê be teplek
Bo paşmawey,
Cigerey şa gilawekan.
Ke şeqiyan le Încîl helda..
Ke çeqoyan na le Qûran..
Kitêbêkî tazet nûsî,
Bo hejar û damawekan..

ROJNAME
Hejarekan:
Le her welat û laye
Le her şiwên û cêgaye
Rojnamekan neyanwêra
Hawar biken
"Tacakey şa,
miqebaye"..
Neyanwêra, hawar biken:
Bergî berî tenha "ba" ye..
Rojnamekan bisûtênin
Şareketan le jêr zibîî
Diroy hemû rojnamekan,
Derbihênin..

XWÊN Û BIRÎN
Ke baxî koşkî zordarê
Gûl rêj dekrê,
Gûl niye zamî hejare,
Ke liqî darêk desûtê,
Dar niye dilî dildare.
Ke bîreyek le ser mêzî
Dewlemendêka dadenrê
Bîre niye,
Xwênî hezaran bêkare...

SORAX
Delên:
Xwa bo Pêxemberê
Şarêkî kird be gomê xwên.
Lem melbende,
Hemû rojê
Çermî pêxemberê minal
Deken be cûtê postal
Bo cendirmeyekî xwên tal.
Xwa bê denge
Ê bişê xwa
E lem şare, tûre bû bê?!
Ê bişê xwa
Be îşêkî taybetî xoy
Bo şiwênêkî dûr, dûr çûbê?!
Belam kam şiwên.
Ey estêre şinasekan:
De direnge
Be teliskob boy bigerên,
Deng û basî em melbendey
Be bê kem û ziyad pê bilên.

BESERHATÎ ŞÛŞE ETRÊ
Ne beyannamey nihênîm
Ne serî piyawî ramyarîm
Min şûşe etrim, gûlawim
Min bo jêr pêy to nekrawim
Destit şikê
Min bo kezî û pirçî xawim
Destit şikê
Wek min xwên le dilit bitkê
Ey cergî daykit helqirçê
Boçî nethêşit bigem be tiwêy
Pirçî kiçê
Ey cergî daykit helqirçê

NEXŞE
Eger nexşey hemû
cîhan,
Têkdenewe..
Eger zewî wekû loke
Şîke newe..
Ke sinûriyan kêşayewe
Dûbare
Her dêmewe bo em şare
Her Kûrdistan,
Dekemewe be nîştîman..

(Kurmancî)

TÊBINIYAN YEKEMÎN
Bila şahinşah guhdar bin
Şaîrek dixwaze bipeyive..
Bila bareş rawestin
Nêrgizek dixwaze bê danîn..
Bila tifing bêdeng bin
Zarokek dixwaze binive..

HEJAR Û BURJUWA
Çenteyên destê burjuwayan,
Pere û mîdeyên birçiyan tê de ne..
Çenteyê şaîr,
Wişeyên delal û şiirên agirîn..
Nava dilê burjuwayan,
Keçên rût û tazî tê de ne..
Lê dilê hejaran,
Her nîştîman û nîştîman..

BO MARX
Dema dît ku xwîna çewsandiyan
Dikin hine û wisme
Ji bo simbêlên,
Pehlewanên xesandî.
Dema dît ku serê hejaran
Dikin xwelîdank
Ji bo paşmayinên,
Cigaraya şahên gilaw.
Ku pê li Încîlê xistin..
Ku kêr li Quranê xistin..
Te pirtûkeke nû nivîsî,
Ji bo hejar û demawan..

ROJNAME
Hejarno:
Li her welat û deverê
Li her şûn û cihî
Rojnameyan ku newêribûn
Hawar bikin:
"Taca şah,
Miqawa ye"..
Ku newêribûn hawar bikin:
"Kincê li wî tenê "ba" ye..
Wan bişewitînin
Bajarê xwe ji bin zibila
Derewên van rojnameyan,
Derxînin..

XWÎN Û BIRÎN
Ku baxçeyê zordarekî
Gulrêz dike,
Ne gul e, birîna hejarê ye.
Ku liqa darekê dişewite,
Ne dar e dilê evîndarê ye.
Ku bîrayekê li ser maseya
Dewlemendekî datînin,
Ne bîra ye,
Xwîna bi hezaran bêkaran e...

SALIX
Dibêjin:
Xwedê ji bo pêxemberekî
Bajarekê kir gola xwînê
Di vê deverê de
Her rojek
Çermê pêxemberekî zarok
Dikin cotek postal
Ji bo cendirmeyekî xwîntal
Xwedê bêdeng e
Ê dibe Xwedê
Li vî bajarî hêrs bûbe?!
Ê dibe Xwedê
Ji bo karekî xwe yê taybet
Bo şûneke pir dûr çûbe?!
Lê, kîjan şûnê?
Ey stêrknasno!
De dereng e
Bi teleskobê lê bigerin
Deng û behsa vê deverê
Bi bêkêm û zêde jê re bibêjin

SERBORIYA ŞÛŞEYA BÊHNÊ*
Ez ne beyannameyeke nehênî me
Ez ne serê peyayekî siyasî me
Ez şûşeya bêhne me, gulav im
Ez ji bo binpiyê te nehatime çêkirin
Destê te bişkê
Ez ji bo kezî û porê xav im
Destê te bişkê
Wek min, xwîn ji dilê te biçilke
Wey kezeba diya te hilqirçe
Ji bo çi te nehişt bigihêm bisk û porê keçekê
Wey kezeba diya te hilqirçe

NEXŞE
Eger nexşeya hemû
Cîhanê,
Têk bibin
Eger zevî weke pembo
Vebe
Ku sînor dîsa bên kişandin
Dubare
Her dem ez têm vî bajarî
Her Kurdistan
Dîsa dikim nîştiman.

* Li bajarê Silêmaniyê Qeyseriya Neqîb ji aliyê hêzên Sedam ve hate şewitandin û talankirin, ji ber ku serleşkerekî Sedam li wir hatibû kuştin. Helbestvan di nav vê bûyerê de şûşeyeke bêhnê dide axaftin.

Werger: PISMAM

FERHENGOK
Wişe: Peyv, bêje
Wisme: Piştî hineyê li por dikin çawa hine por sor dike, ew jî por reş dike
Liq: Şaxa darê
Şiwên: Şûn, cî
Hawar: Qîrîn
Xesaw: Xesandî (Pehlewaneke serneketî û rezîl bûyî û ji mêriyê ketî)
Gilaw: Pir pîs, ji bo kûçik tê bi kar anîn
Damaw: Bêçare
Binive: Razê
Rawestîn: Sekinîn
Xav: Ji bo porê nerm tê bikaranîn
Hilqirçe: Qirçe qirça ku ji êgir tê

Almanya û demokrasiya sexte

Kurdên ku li Almanyayê dijîn wekî her salî îsal jî, xwestin cejna xwe ya neteweyî (Newrozê) bi dilekî xweş û şa, bi dîlan û bextewarî pîroz bikin.

Dema Kurd ber bi salonan ve çûn cihên xwe (ku dê Newroz li wir bihata pîrozkirin,) dîtin, polîsên Alman rê û deriyên salonan girtine û dibêjin, "Pîrozkirina Newrozê qedexe ye." Ew cejna ku ji bo pîrozkirina wê li Amed, Şirnex, Cizîra Botan, Nisêbînê û li her aliyê Kurdistanê bi sedan kes canê xwe yê pak dane û xwe gorî kirine. Lê belê, dewleta Alman îro dibêje, "Pîrozkirina Newrozê qedexe ye." Qedexekirina cejna ku ji çend hezar salî ve tê pîrozkirin, li dijî mirovahiya cîhanê tawaneke pir mezin e.





Li Almanyayê, pir behsa demokrasî û mafên mirovan tê kirin. Lê ew gotin gişt li ser kaxezan dimînin û di pratîkê de tewreke berevajî ji aliyê hêzên dewleta Alman ve tê ber çavan.

TEWRA ALMANYAYÊ

Bi ser re jî, dewleta Alman bi tevî hesp, kûçik û hemû îmkanên xwe ve, bi awayekî har û hovane û terorîstane êrîş dike, bi sedan jin, zarok, kal û pîran birîndar dike. Bi dehan kes jî digire û diavêje bendîxanan. Ji bo ku dilê dewleta Tirk a dagirker xweş bike, çend helîkopter û panzeran zêde bifiroşê. Dewleta Alman xwest ku Kurdan provoke bike, li ba raya giştî ya cîhanê tawanbar nîşan bide. Lê ew bi ser neket. Kurdên welatparêz li hember helwesta dewleta Alman, bêdeng neman û bi her awayî dengê xwe yê mafdar li seranserî Ewrûpayê bilind kirin. Neh Kurdistaniyên welatparêz (8 Kurd û yek jî Tirk bû) xwe şewitandin. Ji van sê kes şehîd ketin. Em li hember bîranîna wan serê xwe ditewînin.

Kurdên ku ji bo rakirina cenazeyên şehîdan li meydanên bajêr civiyabûn, polîsên Alman careke din bi hovîtî êrîşî wan kirin. Her wiha polîsên Alman rûmeta şehîdên me negirtin. Xuya dikir ku dewleta Alman têrî xwe ders negirtibû û pozê wê neşewitîbû. Bi ser re jî, ji gefxwarinên xwe yên vala paş ve nedima.

ARMANCA DEWLETA ALMAN

Gelo dewleta Alman çi dixwaze, an çima wiha dike? Ji bo ku em bikaribin bersiva vê pirsê bidin, divê em hinek dakevin dîroka pêwendiyên Alman û Tirkan. An bi navên wan ên berê Împaratoriya Osmanî û Prûsya. Bi derketina çîna burjûwa û pêşveçûna zanistî û teknîkî li Ewrûpayê guhertinên pir mezin çêbûn. Çîna burjûwa şoreş kir, îktîdar bi dest xist, teknîk kire xizmeta leşkeriyê, artêşên nûjen damezirandin û dest bi dagirkirina cîhanê kirin. Împaratoriya Osmanî a feodal û kevneperest temenê xwe tije kiribû û divê bihata hilweşandin. Hemberî, nakokî û berjewendiyên di nav dewlet û împaratoriyên mêtingehkar de, li ser parvekirina Împaratoriya Osmanî, bihevnekirina wan temenê wê direj kir. Împaratoriya Osmanî, êdî nikaribû li ser pişta hespan, bi şûr û mertal li ber xwe bide û ji Ewrûpa û Balkanan bi darê zorê dihatin derkirin. Ji sedsala 18'î û pê ve gelên Balkanê serî hildan. Bulxar, Yewnanîstan û Romanya serxwebûna xwe wergirtin. Dîsa di van salan de Rûsya êrîşên xurt dianî ser Osmaniyan û bi taybetî van salan ango sedsala 19'an bûbû sedsala serhildanên Kurdan. Di aliyekî din ve, ji Başûr ve Waliyê Misirê M. Ali Paşa êrîş dianî ser Osmaniyan. Bajarên Edene û Qonya wergirtibûn û heta nêzîkî Stenbolê berî Osmaniyan dabûn.

TÊKILIYÊN ALMANYA ÊN DÎROKÎ

Di vê sedsaliyê de, Împaratoriya Osmanî ji hêz ketibû. Di 1808'an de Mahmud II. hat ser hikm, artêşa "Yeni Çeri" ji holê rakir (1826), li şûna wê artêşeke nû bi navê "Nizam–i Cedid" bi cil, qaîde, perwerdeya Ewrûpayî û ji 48 hezar leşkerî pêkhatî damezirandibû.

Rola Almanyayê ji vir pê ve dest pê dike. Almanyayê yekîtiya xwe dereng çêkir. Heta ku yekîtiya xwe çêkir û bi hêz bû, dewletên din, dinyayê li hevûdu pareve kiribûn û ji wê re cih nemabû. Almanyayê çav berdabû Rojhilata Navîn, Kafkasya û Asyaya Navîn, ji bo ku di vî warî de bikaribe bi ser bikeve alîkarî û hevalbendiya Osmaniyan diviyabû. Almanan ev siyaset ji xwe re wek bingeh pejirandin û dest bi xebatê kirin. Serhengên (subayên) Almanyayê yên ritbebilind artêşa Osmaniyan ya nû perwerde û rêkûpêk kirin. Îro jî dewleta Almanyayê tîmên taybetî yên Tirkiyeyê perwerde dikin. Polîtîka îro û ya wê demê çiqas dişibe hevdu. Ev serhengên Alman, mamostetiya leşkerî, şîretdarî û pisporiya wan dikirin. Beşdariya êrîş û cengên Osmaniyan dibûn. Yek ji wan serhengên herî bi nav û deng Helmut Von Moltke bû, Moltke beşdarî êrîşên Xerzan û Şengalê bûbû. Der barê Kurd û Kurdistanê de name û bîranînên xwe nivîsandibû. Wî bi xwe nêzîkî 30 salî serokartêşiya Almanyayê kiribû.

> *Bavê ramana Turanîzmê jî Almanya bi xwe bû, "Partiya İttihat û Terakki" xewnên împaratoriya Turan didîtin. Ew xewn Osmaniyan kirin hevalbendê Almanyayê û herdu hevalbend ketin Cenga Cîhanê ya Yekemîn. Di dawiya cengê de, herdu dewlet jî têk çûn. Lê, çi bû, bi Kurdan bû. Li Eniya Kafkasyayê Enver Paşa 90 hezar Kurd da kuştin. Û xela û birçîbûn jî li aliyekî... Encam, bi sedhezaran Kurd mirin.*

Ger ne destek û alîkariya Almanyayê bûya, Osmaniyan tenê nikaribûn serhildanên Kurdan têk bibin û bi deh hezaran Kurd nedihatin kuştin.


Bavê ramana Turanîzmê jî Almanya bi xwe bû, "Partiya İttihat û Terakki" xewnên împaratoriya Turan didîtin. Ew xewn Osmaniyan kirin hevalbendê Almanyayê û herdu hevalbend ketin Cenga Cîhanê ya Yekemîn. Di dawiya cengê de, herdu dewlet jî têk çûn. Lê, çi bû, bi Kurdan bû. Li Eniya Kafkasyayê Enver Paşa 90 hezar Kurd da kuştin. Û xela û birçîbûn jî li aliyekî... Encam, bi sedhezaran Kurd mirin.

Mustafa Kemal û kemalîzm jî, domahîka "İttihat û Teraki" ne. A ku 70 sal in ku kemalîzmê bi Kurdan kiriye jixwe ne tê gotin û ne jî nivîsîn. Belê, dema mirov li rûpelên dîrokê dinêre, tawan û gunehên dewleta Alman bêhejmar in. Li hember gelê Kurd tew bixwaze, radibe tawanbariya xwe didomîne. Polîtîka Almanyayê ya destpêkê îro jî di rojevê de ye. Qeder û jiyana dewleta Alman û Tirkiyeyê bi hevdu ve hatiye girêdan. Ji bo berjewendiyên xwe yên qirêj, xwîna gelê Kurd dirijînin. Her derba ku gelê Kurd li dewleta Tirk dixe, herwiha li dewleta Alman jî dikeve. Harbûna wê ji vê yekê ye. Almanya bi xwe pir bawer bû ku dê bi van êrîşên xwe ve, gelê Kurd teslîm bigire. Yên ku dixwazin gelê Kurd teslîm bigirin, divê baş bifikirin û li pirêza Zîndana Amedê ya 1982'yan û Mazlum Doğanan baş binêrin. Gelê Kurd êdî pir baş têgihîştiye, ku mirineke bi rûmet, hezar car ji jiyaneke bêrûmet baştir e. Em di mirinê de jiyanê diafirînin. A ku ew tênagihîjin ev e. Ji me can dixwazin, xwîn dixwazin. Belê, em dê canê xwe bidin, xwîna xwe bidin. Lê, dê xwîna me bibe jehr û di gewrî û laşê wan de bimîne û dê ji bo wan bibe mirin.

Robîn REWŞEN

Le keştî Magelan ewe:

Zaniyarî niwê derbarey hesarey Zuhre



Keştiyekî asmanî le katî geranîda

Hesarey zuhre duwem hesarey komeley xore be pêy dûrî le xorewe û dway **etarid** dêt û be dwaney **zewî** (zemîn) dadenrêt çunke zuhre heman baristayî û heman pêkhatinî zewî heye. Lêkolînewey rastewxoy em hesareye le layen zanakanwe le kotayî salekanî heftawe destî pêkirdwe û Rûsiya le salî 1978 yekem keştî asmanî nard bo zuhre û taku niha Rûs 24 keştî û Amerîka 6 keştiyan nardwe bo xulgey zuhre.

Tazetrîn em keştiyaneş brîtiye le keştî Magelanî Amerîkî ke le mayîsî 1989 heldra û le 10'î Tebaxî 1992 geyşte xulgey zuhre û le 24'î Mayîsî 1993 da çiwar xulî be dewrî em hesareye da tewaw kird û niha em keştiye mujulî mezekirdinî bwarî mugnatisi em hesareyeye.

Zanistî asmannasî geyştote lutke û bayexêkî taybetî pê dedrêt çi le layen zanayan û çi le layen cemawerewe û be taybetî diway dirûst kirdnî çendîn core keştî asmanî pêşkewtû û dirust kirdinî çendîn core keştî asmanî be amêrî Elektronî zor wrdewe.

Ewey ke şayenî gotine komeley xor (be pêy nizikî le xorewe: (Etarid, zuhre, zewî, merîx, muşterî, zuhhel, Uranus, Nipton û Ploto) beşêke le galeksî (rêgay ka kêşan) ke be çawî rût le asman da debînrêt û zanakan way bo deçîn ke dêskêkî rû textî pêkhatû le gaz û hewir bêt û mawekeşî 80 hezar salî rûnakiye (yek salî runakî 300 hezar km le yek çirkeda).

Hesarey zuhre le çend rûyekewe le zewî deçêt belam legel emeş da çend ciyawaziyekî mezin lenavberiyan da heye bo nimune pley germî rûy zuhre 500 million pleye, le katêkda pley germî ser rûy zewî 60-90 pley sediye, le ber ewe rûy zuhre zor germe û hewrêkî çir daydepoşê ke be şêweyekî serekî pêk dêt le gazî dûwem oxîdî karbon û gaze nayabekanî tir.

Belam keşî zewî pêk dêt le oxsîjin û naytrocîn û hendê le gaze degmenekan û herweha palepestoy zuhre 90 car le palepestoy zewî ziyatire û rûy zuhre dwî tiya niye. Ewey zanayan deyxwazin birîtiye le diyarî kirdinî le yek çûn û leyek neçunî zuhre û zewî le hemû rûyekewe be taybetîş atmosfêr û rûy herdû hesareke û ta êstaş zanayan lew baweredan ke herdû hesareke le rûy Geologiyewe le yek deçîn.

Zorbey ew zaniyariyaney ke le keştiye asmaniyekan ewe be zewî degat ewe deselmênêt ke zar million sal û keştiye asmaniyekanî Rûsiya le salekanî heşta da wêney 146 çaliyan girtwe leser rûy zuhre û hemuşiyan rûberiyan leyekewe nizîke û tîrey heryekeyan le 8 km ziyatire û em çalaneş dekewne beşî bakûrî hesarekewe belam magelan wêney çendîn çalî girtwe le deverî corbecorî zuhre da û rûberîşyan zor gewreye, ya gotinêye tîrey em çalane le ser zewî zor keme û nagate 100 m.

Zanayan way bo deçin ke ew berge hewa çirey be dewrî zuhreweye debête hoy têkşikandinî her tenêkî biçûk ke piyayda teper bêt bo ser zuhre belam tene mezinekan be tewawî wird nabin û le naw naçin belkû debin be çend parçeyek û le ser rûy hesareke çend çalêk dirust deken.

Çalekan leser hesare corbecorekan be têperbûnî kat dûçarî şîbûnewe debin be hoy pley berzî germî û bay tund û burkan û hokarî tirewe be corêk ewey lem çalane mabêtewe birîtiye le hendê rûy zuhre britiye le çal û lutkey burkan û zincire çiyay bilind û dol (şîw) û em zaniyariyaneş disanewe le layen (magelan) ewe dûbare selmêndrawetewe belam em careyan be şêweyekî wrdtir le caranî pêşû çunke Magelanî Amêrêkî radarî pêşkewtûy têdaye ke gurze radariyekan arastey rûy zuhre dekat û be wrdî wêney her beşêk bixwazêt degrêt.

Tazetrîn em keştiyaneş brîtiye le keştî Magelanî Amerîkî ke le mayîsî 1989 heldra û le 10'î Tebaxî 1992 geyşte xulgey zuhre û le 24'î Mayîsî 1993 da çiwar xulî be dewrî em hesareye da tewaw kird û niha em keştiye mujulî mezekirdinî bwarî mugnatisi em hesareyeye.

ÇAL

Britiye le yekê le diyarde Geologyekanî ser rûy zuhre ke magelan dozîwiyetiyewe û em çalaneş leser rûy hemû hesarekanî komeley xor heye ke behoy berkewtiny hesaroke û kilkdarî tîjrew be rûy reqî em hesarane da dirust bûwe. Zanayan way bo deçin ke seretay em çalaney ser zewî û merîx û mang bigerêtewe bo çiwar hedeştayî biçûk yan gewre ke birîtye le çeqî çalekan û laye daxwrawe kanî.

Zanayan sûd le lêkolînewey şêwe û dabeş bûnî em çalane werdegirin bo diyarî kirdinî temenî hesarekan, lêkolinewey çalekanî ser zewî û mang û etarid way derdexen ke temenî em hesarane le nêwan 3-4 miliyar sal bêt, ta êsta zanayan neyantwanîwe temenî zuhre diyarî biken belam wekû zanrawe û be pêy baştirîn bîrdoze temenî komeley xorî xoman 4 hezar million sale û le lêkolînewey çalekanî komeley xor ewe der dekewêt ke em çalane le yek naçin.

BURKAN

Be pêy ew wênaney ke magelan Nardûnî le 7.8.1990'da çalakiyekî burkanî mezin leser rûy zuhre heye û le dwayş da lekolînewe û şîkirdinewey em wênane deriyan xist qubey burkanîş heye ke le katî teqînewey burkan da dirust debêt be heman şêwe ke leser rûy zewî rû dedat. Cige lem qube burkaniyane magelan wêney çendîn kêlgey lafawî (lava)y nardwe (lava birîtiye lew madeyek ke le katî burkan teqîneweda dirust debêt) herweha madey (magma) ş leser rûy zuhre dozrawetewe (magma ew madeyeye yan kevre le doxî şîlîda û le şiwênî burkanekanî ser rûy zewî heye).

Le ber ewey barwdoxî ser rûy zuhre ciyawaze legel zewî cunke pley germî zuhre zor berze û awîtiya niye le ber ewe zanakan lew baweredan ke corî teqînewey burkanekan le her yek lem dû hesareyada ciyawaz bin.

ÇIYA

Bêguman hemû berzayekanî ser rûy zuhre burkan nîn hendêkiyan çiyan û bilindtirîniyan çiyay (maxwel) e ke 1000m. leser rûy zuhrewe berze û herweha hendê berzayî tir leser rûy zuhre dozrawetewe ke be aştar naw debrêt û em çiyaneş be şêweyekî rûn le wênekan da derdekewin.

Le wênekanewe wa derdekewêt ke çiyakanî ser rûy zuhre şêwey xoyan parastwe le ber hêminî heway hesareke û herweha nebûnî aw ke dû hoy zor giringn le gorankariye fiziyawiyekanî da.

Zanakan depirsin û delên: aya em hesareye pêş 500 million sal lemewpêş rûyekî ciyawazî lem rûey êstay hebûye??

Aya çon çiyakî zabelahî bilindtir le lutkey averêst be pêwe westawe le katêk da kevrekanî le nawendî pley tûwanewe daye?? Aya em hesareye le rûy geologiyewe mirdwe yan zîndwe?

Em core pirsiyarane pêwîstî be katêkî dûr û dirêj heye bo welam danewe û bêguman karêkî awhaş pêwîstî be keştî asmanî pêşkewtû tir heye ke rastewxo leser rûy zuhre binîşêtewe û lêkolînewe û pişknînî rastewxo erkî serekî bêt.

Bekir BAHOZ

Li Tirkiyeyê ne demokrasî û ne jî misilmantî heye

Tirkan ji dema Osmaniyan ve heta niha Kurdên Sunî bi riya hinek terîqet, dem û dezgehan ve, bi dewletê ve girê dane, xapandine. Daxwaz û serhildanên Kurdan ên neteweyî û demokratîk bi felsefeya Sunîtiyê dane sekinandin an jî vemirandin. Bi kemalîzmê re jî Kurdên Alevî xapandin û dixapînin. Wiha nîşan didin ku kemalîzm laîsîzm e laîsîzm, demokrasî ye. Bîr û baweriyên modern e. Ji ber vê yekê jî dewlet heta cihekî bi ser ketiye.

Dewleta Tirk ji dema Osmaniyan ve heta dema Mustafa Kemal, bi felsefe û sloganên dînî xelkê Kurd xapandiye. Di dema Mustafa Kemal de jî ev felsefe bûye sloganên dînî û metodên xapandinê, "laiklik" jî lê hatiye zêdekirin. Laiklik li Tirkiyeyê kemalîzm e. Ji dema Osmaniyan ve heta niha li Tirkiyeyê dînê îslamê mezhebê Sunî tê qebûlkirin û zanîn. Yanî li Tirkiyeyê, îro yên ku ne Sunî bin misilman nayên hesibandin. Sunî dîyanetê îdare dikin. Li kesên ne bi Sunî çavên kafirîtiyê û gawirîtiyê mêze dikin û wê muameleyê li wan dikin. Di vî warî de qetlîamên bajarên Meletê, Dêrsim û Mereşê mînakên herî berbiçav in. Ji ber ku piraniya Tirkan Sunî ne, mezhebê resmî jî Sunî ye. Ya din, siyaset û demokrasî, her tişt bi tenê ji bo Tirkan e.

Tirkan ji dema Osmaniyan ve heta niha Kurdên Sunî bi riya hinek terîqet, dem û dezgehan ve, bi dewletê ve girê dane, xapandine. Daxwaz û serhildanên Kurdan ên neteweyî û demokratîk bi felsefeya Sunîtiyê dane sekinandin an jî vemirandin. Bi kemalîzmê re jî Kurdên Alevî xapandin û dixapînin. Wiha nîşan didin ku kemalîzm laîsîzm e laîsîzm, demokrasî ye. Bîr û baweriyên modern e. Ji ber vê yekê jî dewlet heta cihekî bi ser ketiye. Li deverên weke Dêrsim, Ezirgan, Meletê, Elezîz, Mereşê û cihên din wiha kiriye. Kurdên Alevî di nav partiyên kemalîst de wekî CHP, SHP, DSP û yên din de bi rêxistin kiriye. Ji wan Kurdên Alevî xwedêgiravê ew di wan partiyan de têkoşîna sosyalîzm û pêşverûtiyê didin. Kurdên Alevî li Stenbolê derdikevin kuçan û diqîrin "Tirkiye laîk e û dê laîk bimîne.."

Yên Sunî jî di nav partiyên wekî ANAP, DYP, RP, DP û yên din de têkoşîna demokrasiyê, lîberalîzmê û misilmantiyê didin. Ew nizanin ku ev lîstikên dewleta Osmanî ne ku ji komara Tirk re wekî mîras û tecrûbe mane û didomînin. Dewleta Tirk bi Sunîtî û Alevîtiyê carekê din Kurdan ji hevdu qetandiye û kiriye du cih. Pişt re wan li dijî hevdu bi kar tîne. Her wiha herdu aliyan ve jî ew kirine bin kontrola xwe û xistiye xizmeta dewletê. Di bingeha xwe de tu ferqa SHP û Refahê tune ye. Ferqa ANAP an jî DYP û RP tune ye. Hemû jî Tirk in û misilman in. Gelo çi ferqa SHP û MHP'ê heye? An jî çi ferqa Türkeş û Karayalçın heye? Gelo ew talankirin, wêrankirin, kuştin, lêdan û barkirina ku di van sê salên dawî de li Kurdistanê çêbûn, partiya Çiller û Karayalçın bi xwe nekirin û nakin? Türkeş an Erbakan bûya dê ji wan bêhtir an jî cudatir çi bikirina? Ma hîn ji vê yekê jî xerabtir û barbartir rejîmeke din jî heye?

Encama hilbijartina herêmî ya 27'ê Adarê wiha diyar kir ku li seranserî Kurdistanê kemalîzmê îflas kiriye. Êdî li ser navê sosyal demokrasî û sosyalîzm û laîsîzmê kemalîzm nikare gelê Kurd bixapîne. Lê, kêm be jî, vê carê talûkeya partiya Sunî ya RP'ê derket holê. Yanî kemalîzm li Kurdistanê îflas kir, lê dewlet dixwaze bi riya Erbakan dîktatorî û dagirkeriya xwe li Kurdistanê bidomîne. Erbakan ji xelkê re, xwe bi siyaseteke nû û cuda dide xuyakirin. Yanî Erbakanê nîjadperest xwe bi maske û boyaxa dîn xemilandiye û pêça ye. Ew dixwaze îdeolojî û terora dewletê di nav çarşev û cubeyên xwe yên reş de veşêre. Çend salên din jî têkoşîna neteweyî û demokratîk a Kurd a ji bo serxwebûn û azadiyê bide rawestandin.


Li Tirkiyeyê ne demokrasî û ne jî misilmantî heye. Kemalîzm li dijî demokrasiyê û li dijî misilmantiyê ye. Kemalîzm li dijî mirovatiyê ye. Ji ber ku kemalîzm nîjadperestî ye û ev cureyê nîjadperestiya Tirkan bûye Kemalîzm û laîsîzm. Bi gotineke din navê wê Tirkîzm e. Ev jî, îro pir diyar e ku ji faşîstên wan heta demokrat û heta dîndaran, hemû Tirk in û misilman in.

Amed TÎGRÎS



XAÇEPIRS

Amadekar: Rasto Zîlanî



Çeperast: 1–Nivîskar, rojnamevan û zanayên mezin î Kurd. Zêdetirî 25 pirtûkên wî hatine weşandin. Di nav wan pirtûkan de: Mêjûyî Edebî Kurdî û Heşt cildê Riştey Mirwarî. Di sala 1984'an de li Bexdayê çû ser dilovaniya xwe. Di wêneyê de tê dîtin. 2–Îşaret/ Li Başûrê Biçûk navê bajarekî Kurd 3–Kinnivîsîna rêxistineke çepê Tirk/ Qut 4–Zerreyê herî biçûk/ Cejn/ Notayek 5–Rengek/ Sîstemekî bajarî 6–Kinnivîsîna îstîxbarata Sovyeta berê/ Navê nîjadek ku gelê Kurd jî di nav de ye 7–Gule, fişeng 8–Fêkiyek/ Navê rojekê 9–Hêlîn/ Sewalek 10–Bazar, sûk/ Sembola Îrîdîumê

Serejêr: 1–Aza/ Rêncber 2–Amûrên lîstikê/ Amûreke muzîkê 3–Cihê ku genim lê dibe ard/ Amûreke muzîkê/ Kinnivîsîna Amerîkayê 4–Her tim/ Li Îngiltereyê dezgeheke weşanên navneteweyî 5–Paşpirtikeke Îngilîzî/ Notayek 6–Hediye 7–Kûçik/ Madî 8–Li gor zanyaran navê daîreyê ku li hewayê difirin û ji dinyayên din hatine/ Ava ku ji poz tê/ Agir 9–Sembola kromê/ Sembola hesin 10–Mehane 11–Kinnivîsîna "Deoksiribo Nükleik Asit" 12–Hemû tişt bi wî tê naskirin.

BERSIVA XAÇEPIRSA HEFTIYA ÇÛYÎ

Çeperast: 1–Kemal Burkay 2–Arî/ Dê 3–Ner/ Pî/ Zevî 4–Îb/ Kiryar/ Pa 5–Keko/ Nêçîr 6–Ar 7–Lerizîn 8–TKÎ/ Av 9–Alo/ Zekî 10–Zilik/ În

Serejêr: 1–Kanî Yilmaz 2–Ereb/ Li 3–Mîr/ Kartol 4–Kerik 5–Lepik/ Zîzk 6–Îronî 7–Ud/ Nakî 8–Rêzan/ Vîn 9–Erê 10–ATV 11–ÎPÎ 12–Ar

KARTA ABONETIYÊ

Ji kerema xwe re ji hejmara ..... pê ve min bikin aboneyê rojnameya Welat

Nav:

Paşnav:

Navnîşan:

Bedelê abonetiyê razînin:

Li derve: Mazhar Günbat
İş Bankası Cağaloğlu Şub. Şube No: 1095
Döviz tevdiat Hesap No: 3138437

Li Tirkiyê: Mazhar Günbat
İş Bankası Cağaloğlu Şub. Şube No: 1095
Hesap No: 0408342

Ji kerema xwe re cihên li jor vala dagirin û tevî kopiyeke pelê razandina bedelê abonetiyê bişînin.

Navnîşana Welat: Nuruosmaniye Cad. Atay Apt. No:5 Daire No:14 Cağaloğlu / İstanbul
Tel (Fax) 511 50 07

Mercên abonetiyê:

	Li hundir	Li derve
3 meh	175.000	30 DM
6 meh	350.000	60 DM
12 meh	700.000	120 DM

Mindale xoşewîstekan!
Lem parçe nûsîne da hendê honrawey naskî kak Baqî Ebdulxalîq Ebdulla bo êwey azîz û le dila şîrîn e-keyne diyarî û hîwadarîn çêgay rezamendî û xoşîtan bê.

Kak Baqî le salî 1964 le şaroçkey Çemçemal le dayik bûwe. Peymangay hunerî tewaw kirdûwe û seretay karî nûsîn lay ew degerêtewe bo salî 1985. Kakî şaîr ta êsta em berhemaney be çap qeyandûwe: "Bem Xakewe Peywest im", "Mindal û Xêzan" "Nîştiman", "Çok danedan", "Şiwane Biçkoleke", "Baxçey Awat" û "Em Gel û Xakem Xoş Ewêt".

Mehabad KURDÎ

Honrawe bo mindalan


TÊKOŞÎN
Hewil û têkoşîn
Meşxelî rêy jîn
Ême serberzîn
Rêy rastî egrîn
Bo gel dilsoz in
Be hest û soz in
Eger hewil dey
Emro ya sibey
Egey be awat
Jînit naçê jî
Firmêsik narêjî

AZADÎ
Azadî nirxî giran e
Pêwîstî be têkoşan e
Bo rizgarbûn lew jiyan e
Ke pir le êş û jan e
Her kesê tênekoşê
Bergî soriş nepoşê
Ta ku jiyanî mabê
Hergîz rizgarî nabê
Hemû katî jêrdest e
Peste bê hoş û hest e
Ger têkoşê bo azadî
Pêy egat, ejî be şadî

ŞEHÎD
Meşxelî rêy têkoşanî
Rênîşander piştîwanî
Sirûdî demî hemûwanî
Her toy giyan bexiş û qurbanî
Her dem wa le naw dilmanî
Zor berêzitir le caranî
Ey giyan bexiş ey ser le rê
Dilman elê bîrman elê
Her be xwêne aso heldê
Ebê gelîş rêqat bigrê
Belam ewey rêy to negrê
Be serşorî ebê bimrê

NÎŞTIMAN
Daye dengî besozit
Laye layey pîrozit
Mêşik û dil ekatewe
Xemim bîr ebatewe
Têm egeyenê jiyan
Xoşim biwê nîştiman
Herçîm heye besercem
Bîbexşim beziyad, nekem
Be xoştirîn şiwênê
Mirov bimrê bimênê
Her le baweşî ewaye
Ewîş saye û penaye

MAME RÊWÎ
Merheba mame rêwî
Elêy emro bê şêwî..?
Boçî tûkit jakawe
Wa demit dapiçrawe..?!
Kilkit le diwata exşê
Bedît kirdûwe şitê
Wa eroy û zor kizî
Gelê fêlbaz û dizî..!
Belam segelî naw dê
Katê be komel bot dê
Rêyeket lê win ebê
Hemû cergit kun ebê
Nêçîr be dest nahênî
Lew dewre her namênî
Zor çak têy dequçênî
Milî xot deşikênî
Xozge herçî fêlbazî
Biyewê xelkî bigazê
Her zor zû rîswa akra
Karî bedî der exra
Ba wa rûreş biwaye
Heta dinya dinyaye
Qet ney tiwanyaye fêl kat
Gomawî rastî fêl kat



ÇIYA

Nizar kûre qûtabiyekî zîrek û wirya bû, le yekêk le qûtabxanekanî Beyrût da deyxwênd, le katî pişû da bû, Qeys î hawrêy lêy pirsî:

– Baş e Nizar çiya le çiyewe dirûst bûwe?!

Nizar witî:

– Bo ta êsta nazanî?!

Nexêr...!!

Nizar witî:

– Min bawkim bomî gêrawetewe, ke zemanî zû leşkirêkî zorî dûjmin hêrişyan hênawete ser xakekeman, be mebestî abrû birdinî gelekeman, herçende gele nebezekeman bergiriyekî çakî kirdûwe, belam legel ew dirindane da sûdî nebûwe, boye paş kûştarêkî zor şikawin...

– Yanî le tirsa neşkawin?

– Nexêr, belam em çiyayane zewî jêr pêy gele azakeman bûn..Wîjdanyan neyhêştûwe paş bergiriye azayanekeyan dûjmin be seryan da birwat û welatekeyan dagîr biken.. Sîngyan le rûyan da rast kirdûwetewe û birgiriyan le xakekeman kirdûwe, boye heta hetaye awa be serberzî demêninewe...

–Yanî ewanîş zewî bûn?!

– Belê ewanîş zewî bûn û le rûy dûjmin da rast bûnetewe.

– Baş e ey êsta sûdyan çi ye?

– Êstaş şadî û bextewerî wekû şiney şemal lew çiyayanewe bo şarekeman dêt.. Eger êmeş be çakî bixwênîn û rêbwarî xwêndinekeman bew şemale şadûman bikeyn bêgûman êmeş hemîşe serberz debîn.

(Herdûkiyan biryaryan da ke qûtabxaneyan tawaw kird lew cêga berzane da be serbestî bijîn.)

Lem kate da zeng lêy da û herdukiyan zor be gûrc û golî rêgay polyan girte ber.

Sîrwan REŞÎD

Hevpeyvîn bi hunermend Sîdo Reşo re:

‘Tişt tev li cem min bi can û hest in’



Berhemeke Sîdo Reşo

Sîdo Reşo, hunermendekî Kurd e. Di sala 1960'an de ji dayîkê bûye, li hêla Efrînê. Di sala 1984'an de Fakulteya Hunerî li Şamê xelas kiriye û heta niha şeş diyargehên bi tenê vekirine.

1. Heleb 1987, Salona Îbla
2. Şam 1987, Navenda Çandî ya Sovyetî
3. Heleb 1990, Salona Ekkad
4. Qamişlo 1990, Navenda Çandî ya Erebî
5. Beyrût 1992, Salona Meram
6. Şam 1993, Salona Elseyid.

Sîdo Reşo di warê çêkirina pûtan de hatiye naskirin. Pûtên biçûk û mezin, pûtên wî rewşeke hunerî yên fireh û xweşik didin berçav. Hunermendê me bi nav û deng e. Di nav Ereban de, bêhtir naskirî ye, di nav Kurdan de, wekî gelek hunermend û nivîskarên me yên bi nav û deng ku ne Kurd li wan dibin xwedî, ne jî gelên serdest ji wan re riya ronahiyê vedikin. Ez di wê baweriyê de me gelê ku li hunermendên xwe nebe xwedî nikare li şoreşan bibe xwedî, nikare li xwe jî bibe xwedî. Ev hevpeyvîn jî dengek e ji bo guhên ku hîn dijminan ew mişt pembo nekirine.

Gelek tiştên mirî û jibirkirî, mîna pencereyên kevin, tu ji nû ve wan tînî jiyanê bi rengekî nû, hunerî, çi dihêle ku tu vegerî van xamatan di hunerê xwe de?

– Di destpêkê de tu tişt mirî tune ye, ez baweriyê bi nêrîna guhertinê tînim. Gelgamiş, Odîb, Hanîbal û Melikê Tawûs heta niha sax in. Belkî bi rengekî din bin, lê hîn li jiyanê ne. Pencere û babetên kevin ne girêdayîne bi demekê tenê ve. Heta roja îro di jiyana me ya hemdemî de ne. Pencere niha heye, lê ne ew pencereya salên berê ye. Ez babetên xwe ji jiyana xwe digirim di gel têbîrên zaroktiya min re, çi tiştên ku me berî kirin çi kêf be, çi derd bin; divê ku çavên me li ser pêşerojê vekin.

Berê, di karê te de mirov bi can û laşê xwe cihekî girîng distand (bilûrvan– bêrîvan) dû re hino hino tiştan dewsa mirov girtin, nemaze tiştên bêcan, sedem çi ye?

– Danûstandina min bi van tiştan tevan re wekî danûstandina min bi mirov re ye. Tişt tev de li cem min bi can in û bi hest in. Ji min bawer bike dema ez qeyikekê çêdikim, ez ditirsim ku min deverek jê dewişand yan giran kir, ji min kirî wê ev qeyik biêşe, wê bike axîn. Ez dizanim ku mirov bilindtir e û çêtir e, lê her tişt hevdu dikemilîne. Qeyik, çûk, jin, tevde bi can û hest in.

Ango ev guhertin berdewamek e ji karê teyî kevin re yan na?

– Di rêçeke akademîk de ji hunermend tê xwestin ku hemû babetan bi cih bîne, lê tiştê herî buha û girîng mirov e. Ji ber ez mirov im, divê ez li ser xwe bipeyivim. Lê mixabin –nemaze di vê demê de– ez li mirovan dinihêrim ku ew bixwe karên hunerî ne. Pûtên amade ne, bi nêrîneke hûrbînî ez wan dixwînim, diaxivim û wan diavêjim dûr. Hesta min bi biyanîtiyê kûr e. Kûr e heta tu dixwazî. Nizanim çima yan ez dîn im an jî cîhan bi xwe dîn e.

Gelek caran bakur serê xwe li ezmanê pûtên te hildide. Çi bakur e ev? Girêdana te bi axa gund û bajarê te bi çi rengî ye?

– Hunermend lawê axa xwe ye. Lawê xakûbayatiya xwe ye û têbîrên zaroktiyê xakeke fireh e di vî warî de. Ez li bajarê Helebê çêbûm û li vir mezin bûm, di zaroktiya xwe de ez gelekî diçûm gund –bakurê Sûrî– gund ez bêhiş dikirim bi rewşa xwe ya xweşik, bi dev û lêvên xwe yî lihevhatî, bi rengê çavên xwe, bi sirûşta xwe, bi xurtî canê min pê ve hate girêdan. Ev girêdan bû têkiliyeke hunerî û di karê min de ev tişt xweşik hate xuyakirin.

Navnîşana pûtekî ji yên te ev e (bûyerek ji Helebçeyê). Mêrekî Kurd ji piya rawestiyaye. Çi têkiliya vî mêrî bi bûyerê re heye. Gelo hunermend zimanekî wî yê taybetî heye di vê pêvajoyê de?

– Ya girîng ew e ku tu zanibî, vê li pêş çavên te bûye armanca tîrên zor û koletiyê. Mirov ne tiştekî din e, ma qey ne bes e? Eger ez bi xwe di nava bûyer de nejîm ez nikarim vî bûyerî bi taybetiya wî bikim huner. Belkî ez li ser sorikên Amerîka bipeyivim, karê min wê ji te re bibêje bê çiqasî ev bûyer ketiye dilê min û tev li xwîna min bûye yan na. Ev nêrîna min e. Baş e ku tu zanibî pê ku ez ji bavekî Kurd im û diya min Ereb bû. Ev ji min re ne ewqasî girîng e. Ji ber ku mirov ew li ber lingê zorê ye. Li kîjan hêlê be ji cîhanê divê ez li ser rawestim û bipeyivim ji ber ku ew mirov ez im, yekemîn divê mirov biryarên mirovayetiyê daxîne meydanê, dûmahî bi dûv re tê.

Dibêjin Kurdên Şengalê ji darên spîndarê tizbî û bilûr çêdikirin. Gelo nêrîna te çi ye ku ji we hat xwestin ku hûn berê xwe bidin çiyayên Kurdistanê û li ser kevirên çiyê pût û wêneyên dîroka me çêbikin?

– Çiyayên Kurdistanê ne bi hewceyî hunermendan in da xweşik bibin. Hezar sal in çêkirî ne û xweşik in û bilind in. Sirûşt jî hunermendeke herî mezin e. Çiya bi xwe li ser gelê Kurd dipeyivin, helbestvan Şêrko Bêkes çiya di helbesteke xwe de dike şervanekî xurt û hêja û serbilind, weke Nerûda dema ji kevirên şîllî re distira, min jî pûtek çêkir bi navnîşana nalîna çiyê ew bi xwe şivan e, ku min wî bi awayekî hunerî pêk aniye mîna çiyayekî.

Pirsa dawî li ser cîhaniya huner e. Di baweriya te de çi bingeh rast e ji cîhaniya hunermend re?

– Îro cîhaniya hunermend di welatên Rojava re derbas dibe. Ez neçûme wir. Lê ez gelekî dibihîzim ku hat ji sedî ji salonan di destê sehyûniyan de ye. Lê nabêjin ku armanca wan tevan pere ye berî her tiştî. Lê pirs ev e. Gelo xwediyê van salonan kîjan hunermendî derdixin û wî bi cîhanê didin naskirin? Bi rastî hilbijartina wan ne li ser bingeheke vala ye û gelekî dûr e ku hunermendekî normal yan kêmtir derxin. Pirî caran hunermendên xwedî îmkaniyatên hunerî yên mezin bi ser dixin. Tev ku hunermend in jî hene ji dervî vê lîskê û bi xwêdana xwe digihîjin cîhaniyê û têne naskirin. Cîhaniya huner di xurtbûn û xweşikbûna wê de ye.

Hevpeyvîn:
Evdilhelîm YÛSIV

welat

• Li ser navê İMC Basın-Yayın Ltd. Şti. (adına) Xwedî (Sahibi) Zübeyir Aydar
• Berpirsiyarê Nivîsaran (Yazı İşleri Müdürü) Mazhar Günbat
• Navnîşan (Adres) Nuruosmaniye Cad. Atay Apt. No:5 Daire No:14 Cağaloğlu / İstanbul • Tel (fax) 511 50 07
• Nûnerên Rojhilata Navîn (Ortadoğu Temsilcileri) Fener Rojbiyanî – Jan Dost
• Nûneriya Ewrûpa (Avrupa Temsilciliği) Amed Tîgrîs
• Navnîşan (Adres) Drakenbergsg. 63, NB. 117 41 Stockholm / Sweden • Tel (0046) 884 01 25 • Fax (0046) 884 96 35
• Çapkirin (Baskı) Yeni Asya Matbaacılık